# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ SAL: 1 HEJMAR: 16 5 ADAR 1995 BUHA:25.000 TL(KDVD)


Cejna we ya Remezanê pîroz be



## Piştgiriya jinan bi Leyla Zana re

'Hezar dost hindik in, dijminek pir e.' Îro li derveyî welêt dost û hevalên dilsoz û delal destê xwe dirêjî gelê kurd dikin. Gelek komele û rêxistinên biyan bi awayekî xurt alîkariya kurdan dikin. Li Almanyayê ji wan komelan yek jî Yekitiya Jinan (Courage) e.

Rûpel 16

## Çawa nivîskarên kurd dibin mehmetçîk?


Ev cure kurd kî ne? Alîkariya şoreşa xwe nakin û ne pêncî, pênc hezar kron nadin tevgera azadiya Kurdistanê, ne di şer de, ne jî di aştiyê de xwedî li tiştekê dernakevin. Dibin mehmetçîk û pênc hezar kron didin dewletê. Wê demê hûn çawa destûrê didin wan ku bibin serokên federasyon û rêxistinên kurdî?

Rûpel 7

## Warêko kon

Ripelanî Welatê Me di şima rastî Darrêz amê. Û miheqeq zî yî balî/dîqatî şima ancito. Darrêz çi to? Yeno çi vate? Şima aşkenî vajî ku ma namê bî qat in merdom Darrêz pê kar ano. Beno ku tikîn verî zî raştî vatêko ina nêwîn amê. La rênê zî ez wazena vatê Darrêz akerî.

Rûpel 11



# ÇIYA DÎSA GERM DIBIN

**Li çiyayên Gabar û Cudî şerê di navbera hêzên ARGK'ê û Artêşa Tirk de her diçe gurtir dibe**

● Bi hatina biharê çiya germ dibin. Bi taybetî li dora çiyayê Gabar û Cudî şerên giran qewimîn. Hezên dewletê roja 20'ê reşemiyê dest bi operasyonekê kir, wan dixwest van herdu çiyan ji destê hêzên ARGK'ê derxin, lê operasyon negihîştin armanca xwe, li hemberî livbaziyên gerîla têk çûn.

Rûpel 10

## 'Bikaranîna peyvên biyan ne kêmasî ye'

**Di dezgeha radyoya SBS'ê de berpirsiyarê beşa kurdî Şahînê B. Soreklî ji bo Welatê me peyivî**

● Berî ku em behsa zimanê xwe bikin, werin em bala xwe bidin zimanên wekî yên farisî, tirkî, maltî... Li gel ku van zimanan, wekî mînak, xwedan dewlet in jî, ew hîn bi bêjeyên biyanî dagirtî ne.

● Di her bernameyeke me de 15–20 deqe nûçe hene. Em hewl didin zimanekî paqij û di radeyeke standard de bi kar bînin. Em hewl didin bi zimanekî wisa nûçeyên xwe pêşkêş bikin, ku her mirovê kurdiya xwe baş be, bikaribe têbigîhe.

Rûpel 8–9



Ji aliyêSerokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji bo sê mehan

## EFÛYA NETEWEYÎ

Rûpel 2

JÛJÎ

Doğan Güzel




DIK

## Cerdevan ji nobetê aciz bûn

Cerdevanên li Kurdistanê ku di şûna leşkeran de nobetê digirin, li ser nobetgirtinê li hev û din nakin û berê xwe didine hev.

Li qezaya Wanê Çildêranê, cerdevanan ji ber nobetê li hev dan. Di lihevxistinê de cerdevanek mir, çar jê cerdevan heşt kes jî birîndar bûn. Bûyer roja 27.2.1995'an li gundê bi navê "Aşağiyanıktaş" qewimî.

Du malbatên cerdevan ku ji hev xeydan bûn, bi hev ketin. Cara pêşîn lec di navbera cerdevan Kadir Çalpan û Emin Kaplan de seat li derdora 17.30'î de derdikeve, piştre bi beşdarbûna maliyên herduyan, lihevxistina bi çekan dest pê dike. Di lihevxistinê de Kadir Çalpan mir û cerdevanên bi navê Ahmet Kaplan, Celal Çalpan, Süleyman Gelmiş, M.Emîn Kaplan, û Gülendam Çatak, Çiğdem Çalpan, İbrahim çatak û Fahrettin Kaplan jî birîndar bûn.

Dema cerdevan di şerê li hemberî gerîla de têne kuştin dewlet ji wan ne dibêje: "Şehîd bûn", gel jî ji wan re dibêje: "Cehimîn." Lê dema ji aliyê hevûdin ve tên kuştin gelo navê mirina wan dibe çi?

**Batman/Welatê Me**

# Konferansa Navneteweyî ya Kurdistanê

Di navbera 24–26'ê meha reşemiyê de bi hevkariya Partiya Sosyalîzma Demokratîk (PDS) û Buroya Agahdariyê ya Kurdistanê (KIB) li Haus am Kölnischen Park'ê Konferansa Navneteweyî ya Kurdistanê li dar. Mebesta konferansê wekî çeraserkirine gelşa kurdî bi riya aştiyê, hate diyar kirin. Ji gel û welatên cur bi cur nêzî 500 kesên pispor beşdarî konferansê bûn. Komisyonên ku ava bûbûn bi baldarî li ser meseleyên ku hildabûn dest, sekinîn. Di konferansê ; Prof. Dr. Ulrich Albrecht li ser "Çekşandina Almanyayê ji bo Tirkiyeyê" ; Parêzer Eberhardt Schulz û Jürgen Korell li ser " Komeleyên Kurdan û Qedexebûna Çalakiyên Siyasî; Parêzer Dieter Hummel li ser "Li Almanyayê Rewşa Dîlên Siyasî" û Rebecca Pini û Mark Müller li ser "Li Tirkiyeyê Mafên Mirovan" sekinî. Ji bilî van Endemê Komîteya Amadekar yê PKS'ê Yaşar Kaya parlamento bi axaftinekê da nasîn, Serokê HADEP'ê Murat Bozlak jî li ser pest û pêkutiyên ku li gelê kurd û endamên HADEP'ê tê kirin, axaftinek kir. Ji Partiya Karkeran ya Îngilîstanê John Austin–Walker, Ji Partiya Yekitiya Keskan 90 Amke Dieter– Scheuer, Profesorê Qanûna Bingehîn Norman Pech û Nûnerê Sendikeya Çapemeniyê Otto Wiebus bi axaftinên xwe beşdarî konferansê bûn.

Di dawiya konferansê de daxuyaniyek encamê hate nivîsîn û pêşkêşî îmzeyan bû. di vê daxuyaniyê de ev tişt têne xwestin:

–Alîkariya ji Tirkiyeyê di cih de divê bê rawestandin

–Pêwist e kesek li Tirkiyeyê nayê vegerandin

–Hikûmeta tirk û alman, ji bo başkirina têkiliyên xwe bila kurdan nekin hincet

– Hikûmeta alman divê li dijî Tirkiyeyê dest biavêje hinek kirinên siyasî, aborî û leşkerî

Hikûmeta alman bila bi Parlamento Kurdistanê ya li Sungunê re têkiliyan deyne

– Pêwist e nasnameya gelê kurd li Almanyayê bê nasîn û berbendkirina li ser çalakiyên komeleyên kurd ji holê rabe

– Divê hemû girtiyên siyasî tavilê bên berdan

– Newroz, wekî cejn bê pejirandin.


Şahiyên kurdan li Ewrûpayê her diçe dikevin rengekî navneteweyî


**Kurd–A**

# Sinn Fein: Neçin Tirkiyeyê

Di kongreya Sinn Fein'ê de hate xwestin ku kes ji bo ger û kêfê kes neçe Tirkiyeyê û turîzma wê boykot bike.

Sinn Feinn, di navbera rojên 25–26 û 27'ê reşemiyê de, li Dublînê, kongreya xwe li dar xist. Di kongreyê de hat gotin ku, "Kurd xwedî mafê çarenûsiyê xwe ne û gerek e Tirkiye ji vê xwestina kurdan qebûl bike. Lê Tirkiye ji bo vê yekê qebûl neke, her hovîtiyê dike. Ji ber van sebeban em li her kesî deng dikin; bila kes bi meqseda turizmê neçe Tirkiyeyê."

**Kurd–A**


Gerry Adams

## KURTENÛÇE...KURT

### Ji bo Özgür Ülkeyê şeva piştgiriyê

Li Almanyayê li bajarê Kölnê bi beşdariya 11 hezar kesan şahiyek ji bo piştgiriya rojnameya Özgür Ülkeyê çêbû. Di şahiyê ku roja 25.2.1995'an pêk hat de, gelek mirovinen nasyar wekî Serokê HADEP'ê Murat Bozlak, Serokê Giştî yê İHD'ê (Komeleya Mafên Mirovan) Akın Birdal, Serokê DEP'ê yê Rûmetî Yaşar Kaya, Serokê Hereketa Îslamî ya Kurdistanê Abdurrahman Durre, Serokê Yekîtiya Alewiyên Kurdistanê Ali Haydar Celasun, Berpirsiyarê Sendîkaya İGM'ê Jürgen Schön û berpirsiyar û endamê Partiya Sosyal Demokrat û Keskan cihê xwe girtin.

Axaftvan li ser pêkutî û tehdeya ku li rojnamevanan dibe, girtina rojnameya Özgür Ülkeyê, binpêkirina mafên mirovan, êrîşên dewletê yên li ser gel û daxwazên pêkanîna demokrasî û aştiyê sekinin.

Hozan û hunermend jî beşdarî şahiya piştgiriyê bûn û bi stranên xwe piştevaniya xwe dane nîşan. Ev kom û kes beşdarî şahiyê bûn : Hozan Zemanî, Emekçî, Şemdîn, Serhat, Ciwan Haco, Fuat Saka, Kabere Heyder, Grup yorum, Grup Munzur, Grup Kızılırmak, Koma Govendê ya Ronahî û Bêrîvanê û Koma Govendê ya Navenda Akademiya Kurdî.

**Köln/Welatê Me**

### Ofîsên tirk bombe kirin

Li bajêrên Almanyayê yên wekî Berlîn, Bremen, Kölnê roja 25'ê reşemiyê banka û buroyên Komara Tirk hatin bombekirin.

Der heqê bombekirina banka û buroyan tê gotin ku, ev yek ji bo protestokirina qetlîamên li Kurdistanê, bikaranîna bombeyên gazê û li hemberî hovîtiya dewleta tirk bêdengiya Ewrûpayê ji aliyê kurdan ve pêk hatiye.

**Welatê Me / Bonn**

### Êrîşek li ser mala hizbullahiyan

Li navenda Batmanê, mala kesekî bi navê Osman Nadir ji aliyê kesên nenas ve hate bombekirin. Di vê bûyerê de 3 kes birîndar bûn.

Di 23'ê reşemiyê de, li taxa Karşıyaka ya Batmanê kesên nenas, di saet 23.30'î de êrîşî ser mala Osman Nadir kir. Bi bombeyên ku avêtine malê 3 kes; Sabahat İzmir, Ayşe Şahin û Aliye Narin bi parçeyê bombeyê birîndar bûn. Piştî bûyerê hersê kes rakirin Nexweşxaneya Batmanê ya Dewletê.

Li gorî çavkaniyên herêmî, sebeba vê êrîşê nayê zanîn û Osman Nadir ku di Belediyeya Batmanê de şofêrtiyê dike, li derdorê xwe wekî hizbullahî tê naskirin.

**Batman/Welatê Me**

### Eskerên 'terorîst'

Li Merzifona Amasyayê, li Alaya Piyadeyê ya 299'an hefteya çûyî 7 leşkerên kurd, bi hinceta teroristbûnê hatin girtin. Kesên ku hatin girtin nasnameyên wan nehate eşkere kirin. Li gorî çapemeniya tirk ew kes di şêlandina cebilxaneyê de hatine girtin. Bûyerên bi vî rengî gelek caran di çapemeniya tirk de balê dikişînin ser xwe.

**Welatê Me**

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 14'an de peyva veşarî **'Bazirganî'** dîtine û pirtûka **"Şevên Spî"** qezenc kirine:

Şoray Çiçek
Bayraklı/İzmir

**Sabiha Cebe**
**Bağlar/D.Bakır**

Mehmet Yıldız
Mersin

**Salih Demir**
**Antalya**

Xaki Bamerdi
Karagümrük/İST.

**Maşallah Kasapan**
**Adana**

Abdulkerim Ormancı
Osmanbey/İST.

**Mehmet Demir**
**Niğde**

M.Mervan Süleyman
Niş/Yugoslavya

**Aziz Nakçı**
**Bartın**

**Ji bo azadiya çapemeniyê û mafên mirovan civîneke bimane li Komeleya Mafên Mirovan li dar ket:**

# 'DINYA DIGERE!'

Li Komela Mafên Mirovan (İHD) Şaxa Stenbolê civîneke ji bo Çapemeniyê, bi navê "Dinya Digere" roja 25'ê reşemiyê li dar ket. Ji saziyên cur bi cur kes beşdarî civînê bûn û di sala 1995'an ango 'Sala Toleransê ' de li ser rewşa mafên mirovan sekinîn. Kesên ku beşdarî civînê bûn ev bûn: Ji Komîsyona jinan ya İHD'yê Sakine Sevim, ji NÇM'ê Cabar Barış, ji Weşanxaneya Sayê İrfan Sancı, ji Platforma Çapemeniya Sosyalîst Ayhan Erkan, ji Weşanxwaneya Belgeyê Ayşe Nur Zarakolu û ji Özgür Ülkeyê Gülsen Yüksel. Di civînê li ser kirinên dewletê hate sekinîn û hate xwestin ku zilm li ser kes û saziyên muxalîf rabe, derbirîna bîr û baweriya bi her awayî serbest be. Di dawiya civînê de jî raporek hate pêşkêşkirin. Di raporê de kirinên li dijî mafên mirovan yên ku dewletê ji serê salê bi vir ve kirine tên diyarkirin. Li gorî raporê niha 103 kes ji ber bîr û baweriyên xwe di girtîgehê de ne. Beşdaran di civînê wiha got: "Ji van kirinan tê derxistin ku navê salê ji bo dewletê tiştekî îfade nake, lewma rêjeya kirinên li dijî mafên mirovan zêdetir dibe."

Di raporê de hinek reqemên ku balê dikişînin ser xwe ev in: ji serê salê bi vir ve 56 rojnamevan û nivîskar ketine bin çav; 1260 weşanên muxalîf hatine berhevkirin; polîsan êrîş birine ser 32 kovar, rojname, serdîka komelan; 13 kes jî ji ber ku li kasetên bi kurdî guhdarî kirine, ketine bin çav. Tiştekî din ku balê dikişîne ser xwe jî ev e; dewletê 84 milyon ceza li televîzyonên ku bi erebî weşan kirine, birîne. Ew jî dide zanîn ku tahamûla dewletê ji tu zimanên hindikahî û gelên li Tirkiyeyê re nîn e.

**Navenda Nûçeyan**



**Di civîne de hate xwestin ku zilm li ser kes û saziyên muxalîf rabe.**

## Dîlên li Konyayê ketin grevê


Girtîgeh ji rojeva rayagiştî dernayên. Li gelek girtîgehên Tirkiyeyê û Kurdistanê li ser girtiyan cerd û pêkûtiyên rivebirên girtîgehan naseknin. Li hemberî van pêkûtiyan girtî jî dest ji berxwedanê bernadin û berxwedanên girtiyan didomin. Li girtîgeha Konyayê girtîyên ji dozê PKK,TDKPGBK, TKP–ML TİKKO ji ber pêkûtî û dijwarbûna şertên hundir ji roja 17'ê mehê bi vir ve dest bi greva birçîbûnê kirine. Dîsa li girtîgeha Bayrampaşayê birêvebirên girtîgehê li ser girtiyan pêkûtî û cerdên xwe didomînin û dixwazin ku girtiyan ji hev belav bikin, bişînin girtîgehên cur bi cur. Girtî li hemberî van êrîşên birêvebiran ne bêdeng in û dest bi berxwedanê kirine.

**Navenda Nûçeyan**

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 16'an; pirtûka **Mehmed Uzun** **"Siya Evînê"** ye. Ev pirtûk ji aliyê weşanxaneya DOZ'ê ve hatiye çapkirin

**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê binivîsînin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

### Xelata Xaçepirsê



"Siya Evînê"
**Mehmed Uzun**

## XAÇEPIRSA BIXELAT (14)


| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Medeniyet / Zimanzan / Di wêneyê de tê dîtin | B | Di şidandinê de kevirek / Sewalek | Ş | Mijîn / Gelekî li Srîlankayê | M | Qet, hîç / Tirkê perayan | T | Dad / Sembola Renyûmê | E | Huseynê ... |
| Q | A | N | A | T | Ê | K | U | R | D | O |
| Pêkhatî / Ziman | J | Ê | H | A | T | Î | Navdarî / Qesela hûrkirî | N | A | M |
| Z | A | R | Esansek / Bizot | M | I | S | K | Xwendina tîpekê / Di dema borî de zayin | L | E |
| Tiştê ji rîs çêbûyî / Vexwarinek | R | Î | S | Î | N | Navek / Kinceke zivistanê | A | Z | E | R |
| A | V | Dîn / Bajarekî kurd | O | L | Cihê çêra pez û dewaran | P | Dema wê bê / Bajarekî Almanyayê | A | T | Î |
| Bi Îngilîzî sen'at / Rêxistineke navnetewayî | A | R | T | Dayik | M | A | K | | | |
| O | N | U | Şolî, ne zelal / Kinnivîsîna Doktor | Ş | Ê | L | O | | | |
| Li Tirkiyeyê rêxistinek / Gihanokek | Î | H | D | Televîzyoneke Alman | R | T | L | | | |
| Û | Şairekî Fransîz | A | R | A | G | O | N | | | |



PEYVA VEŞARÎ: B A Z I R G A N Î

## XAÇEPIRSA BIXELAT (16)

Di wêne de tê dîtin – Hilweşandin – Cih – Xembar – Cejn – Nîvro – Ilmê bedena mirov – Paşgirek – Qesr – Bejin – Qesela hûrkirî – Cînavkeke îşarkî – Çaviya avê – Ar – Cephe – Çiya – Esîl – Sembola Îrîdiûmê – An jî – Navek – Kesê ji eşîra Oramar – Plakeya Taylandê – Notayek – Lêxistin – Xwediyê gund – Navek – Notayek – Sembola Nîkelê – Paşgirek – Tehdît – Sembola Platînê – Tenkît – Gihanokek – Madenek – Gerdûn – Rojek



PEYVA VEŞARÎ: 1 2 3 4 5 6 7 8

www.arsivakurd.org




Gelê Îrlandaya Bakur aştiyê dixwaze, lê aştiyeke birûmet.

Di pêvajoya aştiyê de qonaxeke nû:

# PLANA PÊŞEROJA ÎRLANDAYA BAKUR

**Di 1'ê rezbera (meha 9'an) sala çûyî de IRA'yê piştî 25 salan şer rawestand. Bi şerrawestandinê ji bo aştiyê qonaxeke nû li bakurê Îrlandayê dest pê kir. Lê di gel îlankirina plana pêşeroja herêmê hê jî hikûmeta îngiliz naxwaze bi Sinn Feinê re li ser maseyê rûne.**

Roja 22'yê reşemiyê Serokwezîrê Îngiltereyê John Major û Serokwezîrê Îrlandayê John Bruton plana mineqeşekirinê ya aştiyê li Belfastê daxuyandin. Lê hê jî Sinn Fein wekî partiyên din nayê dîtin. Tê xwestin ku IRA çekên xwe deyne. Piştî daxuyandina planê di dawiya hefteya çûyî de Sinn Feinê xwest ku civînên bilind yên aştiyê dest pê bikin, lê hikûmeta îngiliz ew daxwaz red kir. Sekreterê Hikûmeta Britanyayê yê ji bo Bakurê Îrlandayê Sir Patrick Mayhew xwest ku IRA çekên xwe teslîm bike da ku ji nû ve dest bi şerê çekdar neke. Serokê Sinn Feinê Gerry Adams li hemberî vê gotinê derket û xwest ku partiya wan jî wekî partiyên din bê dîtin, ji ber ku ji sedî deh reya gelê herêmê distînin. Li ser çekdanîna IRA'yê jî Gerry Adams wiha got: "IRA tenê aliyekî hêzên çekdar e, partiya me dixwaze artêşa Britanyayê û polîs tê de, hemû hêzên çekdar; ji çekan bike. Hêza çekdar ya mezin artêşa dagirker û polîs in."

Li gorî wê plana ku wekî pêgava dawîn ya plana aştiyê tê bi navkirin; wê herdu dewlet jî dev ji îdiaya serdestiya xwe ya li ser herêmê berdin, çarenûsa (qedera) herêmê wê bi destê mirovên herêmê bê nivîsîn. Heke mirovên herêmê bixwazin wê karibin bi Îrlandayê re bibin yek. Dîsa plan dibêje ku wê li herêmê meclîseke ji 90 nûneran pêkhatî ava bibe û ji bo ku mafên sivîl û çandî yên katolîk û protestanan bên parastin wê beyanameyeke mafan bê nivîsîn. Dîsa tê gotin wê saziyeke ji nûnerên parlamentoya herêmê û parlamentoya Îrlandayê pêkhatî ava bibe da ku têkiliyên aborî yên herêmê bi Îrlandayê re çêbibin. Biryarên vê saziyê wê bi erêdayîna (tesdîqa) herdu aliyan be û wê mafê herdu aliyan ji bo vetoyê hebe.

Protestanên herêmê ku wekî hevkarên Britanyaya Mezin tê bi navkirin, li hemberî planê reasiyoneke tûj nîşan dan û ew plan rexne kirin. Wan kesên ku wekî Loyalist tên nasîn got ku ev plan wê bibe sedema Îrlandayeke yekbûyî. Li aliyê din Serokê Sinn Fein'ê Gerry Adams îlankirina planê wekî têkçûyîna plana 1920'an ya parçekirina Îrlandayê nirxand. Wî got ku hinek tiştên ew ji ne qeyil in di planê de hene, bes ew plan jî dide zanîn ku mesele di nava Brîtanyayê hel nabe, aliyekî wê yê ku hemû Îrlandayê eleqedar dike jî heye. Sinn Fein û IRA çarenûsiya di destê mirovên herêmê di cih de nabînin, ji ber ku nifûsa herêmê ji sedî 60 protestan in û ew jî naxwazin ji Îngiltereyê veqetin. IRA û Sinn Fein dibêjin ku ji bo çarenûsa bakurê Îrlandayê dengê hemû gelê îrlandî pêwist e.

**Nûçeyên Derve**

DIK

## Herin ji serokên xwe re bibêjin

Dema şerê azadiyê dest pê kir, dewletê jî dek û dolabên xwe dan nîşan. Hindik be jî bi ser ket. Heya beriya şerê azadiyê, me nizanibû pasaport çi ye. Piştre zarokên me yên 6–7 salî jî bûn xwediyê pasaportê û li sûkên Ewrûpayê rast bûn.

Lê îcar li wir bi organîzasyoneke mezin dixine nava karekî xerab; karê eroyînê ku jê re toz jî dibêjin. Bi giranî jî ev kes xortên ji Çewlik (Bingol) û Xarpêtê (Elezîzê) ne. Li wan bajaran hemû kes dizanin ku dewlet bi destê MHP'ê kar û xebatên xwe dike. Daxwaza rayedarê dewletê ew e ku têkiliya xortan û welatparêzan ji hev qut bike. Dizane dema xort li wir bimînin wê çend kes bi welatparêzan re têkiliyê deynin, lewre jî wan dişînin Ewrûpayê ku xwe winda bikin.

Li gorî agahiyan ji pênc hezarî zêdetir xortên kurd di girtîgehên Hamburgê de ne. Beriya çend salan mirovinen ji PKK'ê zor didane ser wan xortan û ew ji wê riyê derdixistin. Heta firsend nedidan wan ku bikevine wê riyê. Lê polisên alman dianîn zimên û digotin ku ev der welatê wan e. Li vir qanûnên wan derbas dibin. Niha jî polîsên alman ji vê rewşê aciz bûne, nizanin çi bikin. Carinan ji PKK'yiyan re, "Werin em bi hev re xebatê li dijî van kesan bikin." dibêjin. Ev kes jî bi vî awayî bersivê didine wan: "Herin ji serokên xwe re bibêjin. Bila herine ba serokê me, wî bibînin."

**Rênas / Almanya**



## REWŞA DINYAYÊ

DR. NİZAMETTİN TOĞUÇ

## Lîstikên li ser birakujiyê

Li Zaxoyê roja 27'ê reşemiyê (sibatê) li cihê bazarê erebeyeke tijî bombeyên TNT'ê teqiya. Li gorî agahiyên ku me bidest xistine 80 kes mirine û bi sedan kes birindar bûne. Em ji miriyan re rehmet û ji birindaran re saxî û selametiyê ji Yezdan dixwazin.

Ew bombe di dilê gelê kurd de teqiya. Ew bombe ne tenê li Zaxoyê, li Amed, Qamîşlo û Mehabadê teqiya... TV'ya tirk di nûçeyên xwe de wiha digot: "Ev bombe an hêzên YNK'ê an jî yên PKK'ê teqandin."

Gotineke pêşiyan heye: "Navê min li navê te, kumê min li serê te." Yanê tiştê ez bikim bixim stûyê xelkê. Eger em kurd ne şahreza bin, wê hîn gelek bombe biteqin û gelek lîstikên mezin li ser me bên lîstin. Wekî ku tê zanîn, piştî Şerê Kendavê komarek federalî li başûr damezirî. Dema hilbijartinan 5 nûnerên DEP'ê jî ji bo çavdêriyê li wir bûn. Bi hemû serokên partiyan re me hevdîtin û axaftin çêkirin. Wê demê şerê birakujiyê di navbera Bere (cephe) û PKK'ê de derneketibû. Lê tirsek wisa hebû. Bi kurtasî me ji wan re wiha got: "Birano Başûr her tim bûye meydana hespên dijminan, her tim dijminan di wê meydanê de hespê xwe bezandine. Eger dijmin rûmetê dide we, ne heyranê çavên we yên reş û belek e. Ji ber şoreşa Bakur pasaportên sor didin we, serokkomar û serokwezîr we qebûl dikin, destûrê didin we ku hûn nûnergehan vekin. Dema şoreş li Bakur tunebû wê demê hûn jî terorîst bûn. Pêşmergeyek dema bihata gundekî Bakur, tirk pê bihesiyana, hemû gundî disotin."

Berpirsiyarekê PDK'ê wiha digot: "Rast e gelek lîstik li ser Başûr hatin lîstin. Bi hezaran pêşmerge di şerê birakujiyê de hatin kuştin. Eger ew pêşmerge ji gorê rabin, wê tif bikin nava çavên me." Lê belê piştî axaftinê bi 10 rojan Bereyê (cephe) êrîş bir ser wargehên PKK'ê. Bi wê jî neman bangî dostên xwe yên tirk kirin, gotin: "Dostino werin, em vî dijminî ji nav xwe biqewirînin." Mixabin dost bûn dijmin û dijmin bûn dost. Wan karbidestan gotinên xwe yên beriya 10 rojan ji bîr kirin û li ser tanqên dijmin, bi pêçîkên xwe nîşanên serkeftinê çêkirin.

Îro jî di navbera hêzên Başûr de şerekî birakujiyê heye. Heyanî niha bi hezaran kurd di vî şerî de hatine kuştin. Diyar e ku serok û karbidestên Başûr ne bi destê xwe ne. Herdem ji xelkê re çûne êş. Tu demî baweriya wan ne bi wan, ne jî bi gelê wan hatiye û mafên xwe yên şexsî di ser mafên neteweyî re girtine. Bi zanîn an jî bêzanîn, herdem pala xwe dane dijminên xwe, çi dema dijminê wan xwe ji ber pişta wan kişandiye, ketine. Wek masiyekî di nava teştek av de. Çi dema dijmin xwestiye masî bixwe, av rijandiye.

Belê kurd jî ne kurdê berê ne. Kurd şiyar bûne. Li xwe xwedî derdikevin. Wan dost û dijminên xwe jî baş nas kirine. Serok û rêberên xwe jî baş nas kirine. Kî ji bo wan xebatê dike, kî wan dikire û difroşe, ew gişan nas dikin û hesap ji herkesî dipirsin.

www.arsivakurd.org

# FAL

**BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Hûn ji ber çi ewqas aciz in, ev endişeya di dilê we de çi ye? Meraq nekin, cihê we zû bi zû naguhere. Ev tiştên ku li serê we diqewimin ne baş bin jî, hûn dikarin baştir bikin. Gerek e hûn li ber tiştên wiha stûyê xwe xwar nekin.

**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Ji evîna we wê ji we re gulek were, bizanibin ku ev gul rîya zewacê dide pêşiya we. Di tiştên wiha de diltenik nebin, hûn jî tewra xwe deynin holê, niyeta we ya zewacê hebe bizewicin, tu nehebe jî xwe nexapînin.

**CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Xebata we ya bi şevê û razana we ya bi rojê qet bi hev nakeve, ev fikir kê xistiye hişê we, ew kes di dereca yekemîn de ji jiyana we berpirsiyar e. Dev ji fikrên kesan ên ku li ser we amade kirinê berdin. Hûn fikrên xwe bi kar bînin, hîn çêtir e.

**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)**

Bapîrê we û malbata we tu car wekî we li ser rêkûpêkiya gelê xwe nexebitîbû. Ev baş e, feqet ew rewşa ku hûn tê dan e jî ne baş e. Hûn dixwazin baştir bikin, lê gerek hûn ji kesî hêvîdar nebin. Hinekî zêde bixebitin.

**ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)**

Tengasiyên we hene. Hûn dikarin ji hevalekî xwe alîkariyê bixwazin. Lê belê gelş ne ev tenê ye. Gelşa we ya herî mezin ew e ku hûn tiştên mezin nafikirin û li gorî karên xwe amade nakin. Bi rastî jî tiraliya we dîsa li ser we ye.

**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Hinek kes bi dizî û eşkere we mehkeme dikin, haya we bila jê hebe. Heke hûn dixwazin wan kesan nas bikin, divê hûn çavvekirî bin. Di dawiyê de nikarin bi we tiştekî bikin, lê dibe zirarê bidin karê we.

**MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Bihar tê, ev çi halê we ye? Hûn her roj cilên zivistanê distînin. Ewqas ji nexweşiyê netirsin, nexweşî tenê ne bi sermayê ye, bi germê jî mirov nexweş dikeve. Mirov gerek e qet ji tiştekî netirse, tirs kêmasiyên mirov derdixe.

**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Hûn dixwazin du karan bi hev re bikin, ew jî ne mumkûn e. Divê hûn dev ji vî mentiqî berdin, herkes li gorî giraniya barê xwe dikare di rê de here. Giraniya barê mirov ku zêde bû mirov nikare zû bi zû bigihîje armanca xwe.

**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Êdî hişyar bin, ev çi xew e hûn radizên, waxta nêçîra we hatiye kevana xwe hildin herin li pey rizqê xwe bigerin. Guherîn ji bo we pêwist e. Hûn çiqas zû biguherin ji bo aboriya we ewqas baş e. Rawestîn ji bo we qedexe ye.

**KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Hûn çiqas li muzikên biyan guhdariyê dikin, hinekî li muzîka kurdî vegerin. Ji muzîka xwe bigihêjin sentezeke nû, ji bo hunermendiyê ew tişt pêwist e, nexwe hûn nikarin bêjin: "Ez hunermend im." Xwe ji barana adarê biparêzin.

**DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Evîndarî çiqas xweş be di evînê de pêwist e mirov ji psîkolojiya însên jî fêhm bike. Evîn ruhê mirov sivik dike, lê êqil serê mirov dibe. Dev ji karên bêmentiqî berdin, dildara xwe eciz nekin.

**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Hinek kesên ku li dora we digerin, wê tiştekî bînin serê we. Divê haya we ji we hebe, bila ew zirarê nedin we. Deriyeke zerîn li ber we ye, lê pêşî hûnê têkevin hinek tengasiyan, bêhnfireh bin.

Serokwezîra we Chiller bang li dibistana xwe ya berê dike: (*)

# Ez ji bo we jî bigirîm ?!



Tansu Çiller

Me qet boykot nekiribûye, na me nekiribûye neviyên Robertê (Boğaziçi ji koleja Robertê tê.) yên qehreman. Heta dema ku pereyên me qet tunebûn Ozher, rojekê xwe negirtiye, "Tansue ez debar nakim, çarek nikare bêyî ku colayê vexwe bisekine, ezê Coca Cola'yê boykot bikim." gotiye. Me gotiye: "Bêhnfireh be Ozher, hêrs nebe." He he he! Binêrin min ji bo we espriyek pekandibûye. Ez niha dihizim ku li dibistana min a berê realiteya boykotê hebûye. Dixwazine pêşiya vê xwîşka we bibirin, zariyên navdar yên Rumeliyê (Boğaziçi di ser Hisara Rumeliyê re ye). Li wan çavên min ên tijî hêstir binêrin û bibêjin, hûnê rê bidin vê yekê ?! Ez Boğaziçiyê bikim bajar, hiii ez bikim?! Ez we gişkan bikim walî?! Min kir û çû, belê min kir û çû. Bes hûn boykotê nekin, zarokên Swisreya (navê daristaneke di nava kampûsê mektebê de ye) warê çêlekên qelew. Em jî li vê dibistanê çêriyane. Feydeperestên ku hesûdiyê dikin hene. Ew cahîliya me didin rûyê me, dixwazin mesajê bidin derdorên tarî ku li Boğaziçiyê xwendekar baş perwerde nabine. Heke li dibistana min jî li dijî min boykot çêbe bêdayîk, bêxwîşk, bêezan, bêal, namîne ev welatê bihuşt, mulayîmên (sernerm) qentîna sosyeteyê (dixwaze bibêje mudavîm yanê kesên ku diçin wê qentînê). Em dibêjin nekin, nekin. Vê mothera (dayîk) xwe xembar nekin. Di sala 2020'an de emê wan gişkan çareser bikine. Ji bo xwarinê emê li vejeteryanan (kesên ku goşt naxwin) bêpere, hebên şîn belav bikin. Ji bo xercan jî emê tiştekî bifikirin, hele bila sala 2020'an were. Zariyên Galaksiyê yên jîrek...

**(*) Ev nivîs ji belavokeke xwendekarên Boğaziçiyê hatiye wergerandin.**

# 'Mihemed wî nas nake, Îsa wî qebûl nake'

Ji ber şerê ku li Kurdistanê didome wezîr û rêvebiren tirk, nema wêrin derkevin derve. Diçin kîjan welatî wekî şeqamekê ev xerabiyên wan li rûyên wan dikevin. Lê çi feyde rûyê wan naêşe. Bi ber xwe nakevin. Di ser de jî radibin dibêjin: "Me jî tevî Yekîtiya Gumrukê bikin." Parlamantoya Ewrûpayê jî biryar stand got: "An tuyê xwe rast bikî, yan jî em vê xwarbûna te di nav xwe de bi cih nakin." Lê dewleta tirk naxwaze xwe ne ji dêrê ne jî ji mizgeftê bike. Rastkirina xwe jî qebûl nake û dixwaze ku têkeve nava saziyên Ewrûpayê jî.

Ev rewşa KT'ê pêkenokek anî bîra min. Yekî fileh dibe misilman û paşê di wexteke kin de dimire. Li ser mirina wî diya wî û xwehên wî li ser wî digirîn. Meleyê me dibêje: "Negirîn, di ola me de girî ne baş e." Xwediyê mirî dibêjin: "Em ne ji bo mirina wî digirîn. Em dibêjin Mihemed hîn wî nas nake. Îsa jî nema wî qebûl dike. Ka wê ev biçe ku derê?"

**Xwediyê bîstên û silava rêwî**

Xwediyê bîstên li nava bîstên dixebite. Yekî rêwî derbas dibe. Silavê lê dike. Xwediyê bîstên bersivê nadê. Careke din rêwî silavê dide, deng ji xwediyê bîstên dernakeve. Rêwî dibêje: "Dibe ku deng neçûyê." Bi dengekî bilind dibêje: "Selamûn eleykûm" Xwediyê bîstên nema debar dike û lê vedigerîne: "Ne eleykûm selam û ne li ser çavan." Rêwî şaş dimîne, dibêje: "Kuro ma min tiştekî xerab ji te re got? Tu çima hêrs dibî." Xwediyê bistên dibêje: Eleykûmselam, merhebayê dixwaze, merheba jî petîx dixwaze. Bimeşe bi riya xwe de."

Rewşa dewletê bûye wekî ya xwediyê bîstên. Ji ber ku nema kare vî şerî bidomîne û di nava civaka nawneteweyî de kare bi cih bibe. Ew dixwaze ku mafên kurdan ên çandî û perwerdeyî qebûl bike. Lê tirsa wê ji petîxe ku ji destê wê here, heye.

MAMOSTE BEDRAN BÊNAV

# Koçer û mele

Mirovekî koçer radibe diçe Amedê. Asûk û bazarên xwe dike. Ji nifşikê ve bi dengekî bilind mele azanê dide. Koçerê me şaş dimîne. Dipirse dibêje: "Gelo çi diqewime?" Mirovên li dora wî jê re dibêjin: "Mele ye, ji bo Xwedê azanê dide. Ji bo ku mirov biçin nimêjê bikin." Koçerê me dibêje: "Xesara pez tê de heye an na?" Ew mirovên ku li dora wî ne dibêjin: "Na bavo xesara pez tê de tune ye." Li ser vê bersivê koçerê me dibêje: "Wexta ku xesara pez tê de tunebe, heta êvarê bila bang bike."

MAMOSTE BEDRAN BÊNAV



# 'BILA EW ZEBANÎ BI HALÊ ME KÊFXWEŞ NEBIN'

## Ji Newroza sala çûyî dîmeneke serhildanê



Xaniyê wan li derveyî Nisêbînê bû. Ev taxa kesên ku li gundan bêrevî û xizan bû. Yên ku çend pez û dewarên xwe firotibûn, ji xwe re li vê taxê çavek xanî ava kiribûn. Yên ku li nava navçeyê kar bidîtana dixebitîn. Yên din zivistanê li vir diman, bi hatina adarê re berê xwe didan Konya, Antalya, Îzmîr û bajarên din...

Elî, li gorî gotina diya wî sî û yek salî bû. Yekî pir dilovan û dilnerm bû. Du sal dibistana pêşîn xwendibû, li gund. Lê dema hatin bajêr, malbata wî nedikarî wî bide xwendin. Wî geh sol boyax kiribûn, geh ava sar firotibû û geh jî li ber destê terziyan şixulîbû.

Elî niha bavê sê keç û kurekî bû. Bavê wî sala çûyî çûbû rehmetê. Barê wî giran bû. Sermiyanê malê bû. Çavên şeş kesan li destên wî bû.

Wekî hemû mirovên navçeyê Elî jî pir ketibû bin tesîra welatparêzî û şerê çekdar.

Bihar bi hemî xeml û rewşa xwe ve dihat. Xortan dest bi berhevkirina lastîkên erebeyan dikir. Keçan kincên nû didan dirûtin. Şariyên kesk û sor û zer dihonandin. Di hemû malan de Newroza îsal dihat axaftin. Gelo Newroza par xweş çûbû an ya îsal dê xweş bibore.

Elî wekî zarokekî heştsalî xwe ji cejnê re hazir dikir. Êvarî rûyê xwe kur kir. Kincên xwe ûtî kirin. Serê xwe şûşt. Got:

– Dayê sibê Newroz e. Divê ku em dilê wê nehêlin. Çawa ku Newroz tê, her der bi kulîlkan tê xemilandin, bêhna xweş difûre. Divê em jî layiqî vê xweşikayê bin.

Elî ji bo roja Newrozê jî wezîfe standibû. Diviyabû li çend kolanan bigeriya. Ka gel dê li ku bicive, saet di çenda de dê li hev bicivin. Kijan dirûşm (slogan) wê bên avêtin hwd... Belavokên ku ji komîteyê standibûn li kolanê ku pê ve girêdayî belav kirin. Bi dilekî rehet hat malê, kete nava nivînan, qasekî ramî û bi xew ve çû.

Roj wekî seniyeke sor û geş hilat. Gemar û qirêja erdê hêdî hêdî tevlî mij û moranê bû xwe ber bi asîmên ve hilda.

Hola Newrozê xwe ji serîhildaneke nû re amade dikir. Mirov bi biran ji kolanan derdiketin. Bira ku digihîşt holê govend digirt. Dilê herkesî dikire kutekut; ka wê Gelo kengê ala rengîn derkeve holê.

Elî jî wekî serleşkerekî dabû pêşiya mirovên kolanên xwe. Digot:

– Birano! Nekevin heyecanê. Hevdu bernedin. Heta ku em negihîjin holê, bila tu kes sloganan nebêje...

Çemê Çexçex, deşta Bunisra dixemilîne. Kela havînê, dilê xwe hunik dike. Lê carinan bêbext e. Mirovan dike nava pêlên xwe û heta binxetê (Suriye) bi xwe re dibe. Pira Alman di wextê Şerê Dinyayê yê Duyemîn de haţiye avakirin. Ev pir ji bo trênê hatiye çêkirin. Lê berê mirov jî di ser re derbas dibûn. Gelek li ser dihatin ketin, pêlên Çexçex jî ew hembêz dikirin. Berî niha çend salan, ji bo erebe û mirovan pirek hat avakirin, li tenişta Pira Almanan.

Dema koma kolana Elî gihîşte ser pirê, çend cemse û du panzêran pêşiya wan birî. Elî û berpirsiyarên din gotin:

– Hevalino! Ji hev belav nebin. Hevdû bernedin. Bila herkes di cihê xwe de rûnê.

Zarok, dayik, pîr, xort û kal û jin hemû rûniştin. Tîmên taybet, ji cemseyan peya bûn û wekî gurên har êrîş kirin. Zarokan qîr dan...

Panzêran bi himet da ser mirovan. Mirov hatin perçiqandin. Hinekan xwe avêt çem, fişeka pêşî li gewriya Elî ket û ji ser pirê kete nava çemê Çexçexa. Yên ku ketin nava çem dîsa hatin gulebarankirin.

Herkes li hevdû digeriya. Ka kî sax e, kî birîndar e, kî mirî ye. Dayîka Elî, ew nedît, çû mala xwe ew li malê jî nedît. Berê xwe da nexweşxaneyê.

Miriyek hebû li wir. Gelek miriyên din jî. Yek ji wan Elî bû. Mirov digot qey di xeweke giran de ye. Dev bi ken bû. Çavên wî vekirî bûn. Dema dayîka Elî, ew dît, şîniyek got:

"Eliyê mino de rabe
Newroza me bê te nabe
Mala van zalima xera be
Eliyê mino de rabe."

Serekê tîmên taybet yekî gir û dirêj bû. Simbêlê xwe heta bi çena xwe berdabû jêr. Rûyê xwe tenî kiribû. Çawa dît ku dayîka Elî digirî, bi hêrs got:

– Qahpê! Hûn li zarokên xwe xwedî dernakevin. Dema em wan dikujin bi we şîrîn dibin. Hûn bi ermeniyan re dibin hevalbend. Hûn hemû ermenî ne.

Çawa dayîka Elî ev gotin bihîstin got:

– Zû avê bidine min. Ezê rojiya xwe bişkînim. Girî jî li min heram be.

Ava xwe vexwar. Moralê xwe xweş kir û devliken got:

– Bila evên wekî zebaniyan bi halê me kêfxweş nebin.

Dayîka Elî hew yek rondik barand ji çavan û xwe kêfxweş da xuyakirin.

**HESEN ZINAR**

---

Hereketa Îslamî ya Kurdistanê ji bo cejna Remezanê û salvegera Serhildana Şêx Seîd daxuyaniyek belav kir:

## Nebin temaşevanên zilmê

Hereketa Îslamiya Kurdistanê, bi daxuyaniyeke niviskî salvegera 70'an a serhildana Şex Seîd bi bîr anî û cejna Remezanê ya hemû misilmanan piroz kir. Belavoka HIK'ê wiha dest pê dike:

"Roja cejna Remezanê, ya di dawiya meheke wisa de ku tê de gelek feyde û hikmet hene û ji bo civakên Îslamê di gewherê xwe de hînkirin û perwerdekirineke bedenî, ruhî û exlaqî ya salane ye ji bo misilmanan. Ew roleke komcivînî pêk tîne.

Belavok piştî rexnegirtina li misilmanên ku dengê xwe li hemberî zilmê dernayinin, wiha didome :

"Kemalîzma kafir, îro li ber çavên dinyayê gişî qirkirin, talan, zilim û heqaretên xwe bêferqa jin û zilaman, pîr û xortan, biçûk û mezinan, bi destên xwe yên biqirêj, bi awayek bêbextî û her cureyên hovîtiyê li ser gelê kurd pêk tîne. Li hemberî van hemûyan alema Îslamê, temaşevan dimîne. Ev ne şanê insanetiyê ne û ne yê Îslamê ne. Li ser her misilmanî pêwist e ku bi destê kesê zalim bigire û bibêje: "Bisekine bes e." Çawa ku Xwedê jî ferman kiriye "Eger du qebîleyên bawermend şer bikin, wan li hev bînin, na eger yek ji wan aşîtiyê mandel bike û li yê din zilmê bike, terefgîriya yê mezlûm bikin, li hemberî kesê zalim ceng û şer bikin, heta ku hûn wî mecbûrê bi bal qebûlkirina hukmê Xwedê bikin."

Belavok bi van gotinên li jêr xelas dibe:

"Em Şehîdên cîhanê û şehîdên Kurdistanê bi taybetî şehîdên doza dîn û welêt Şêx Seîdê Paloyê ku li hemberî kufra kemalîzma taxûtî di sala 1925'an de serî hildabû û hevalên wî di 70-saliya serhildanê de bi gelek rûmet û rêzdariyan bi bîr tînin.

Daxwaza me ji cîhanê nemaze ji alema Îslamê ew e ku ji doza gelê Kurd agahdar bin. Bi sedemê vê cejna Remezanê em kesên bihevçûyî gazî li hev hatin û aşîtiyê dikin.

Em ji Xwedê dixwazin ku vê cejna Remezanê ji alema Îslamê û cîhanê re bike wesîla aşîtî û şahiyê. "



## Di dezgeha radyoya SBS'ê de berpirsiya
## bernameyên bi zimanê k

# 'BIKARANÎNA PEYVÊN

**Ev bûn dora 12 salan ku ez li Awûsturalyayê bernameyên radyoyê pêşkêş dikim. Destpêk gelek dijwar bû û ne profesyonel bû. Lê îro, eger bernameya me ji çi bernameyan ne baştir be, ez bawer nakim ji yên din xerabtir be jî, bi kalîte û zimanê xwe. Her tişt dikare bi xibreta rojane, bi mentiq û bi xebatê pêşve biçe. Divêt mirov ji karê xwe hez bike û serê xwe piçekî biêşîne. Eger çi kêmasiyên bernameya me hebin, ew bi tiştine ve eleqedar in ku çareserkirina wan ne bi destê me ye.**

**Bêtir ji 20 milyonî kurd di welatê xwe de ji gelek mafên neteweyî û çandî bêpar in. Tu li wî aliyê dinyayê, li Awûsturalyayê, bernameyeke bi kurdî di dezgeheke biyan de pêşkêş dikî. Tu wê bikaribî bi kurtî behsa bernameya kurdî û dezgeha SBS'ê bikî?**

– Di destpêkê de ez dixwazim diyar bikim ku ez li ser navê xwe diaxivim, ne li ser navê tu dezgehan.

Dezgeha SBS'ê, Special Broadcasting Service (Servîsa weşana taybet), dezgeheke fermî ye. Mesrefa wê ji aliyê hikûmeta Awûsturalyayê ve tê dayîn, lê xwediya birêveberiyeke serbixwe ye. Yek ji armancên herî girîng ên SBS'ê pêşvebirina felsefeya pirçandiyê ye (multiculturism). Televizyona SBS'ê nûçe, bername û fîlmên bi zimanên cuda pêşkêş dike. Radyoya SBS'ê, li milê din, bernameyên bi 66 zimanan pêşkêş dike. Di rezbera (îlona) 1985'an de bernameya bi zimanê kurdî jî bû yek ji bernameyên wê. Bala xwe bidê, em behsa bernameyeke bi zimanê kurdî dikin, ne bernameyeke kurdî. Bernameya me niha hefteyê carekê, rojên şemiyê, di navbera katjimêr 10 û 11'ê êvarê de li herdu bajarên herî mezin yên Awûsturalya, li Sydney û Melborn û dorhêlên wan, tê bihîstin. Civaka kurdî li Awûsturalya, bi taybetî kesên bi kurdî diaxivin, li hember civakên wekî îtalî, yewnanî, ereb, vîetnamî, çînî û hinên din, civakeke biçûk e. Lewma, hindik kat ji bo me hatiye dayîn. Lê li dû Şerê Xelîcê hejmara kurdan bêtir bû. Em hêvîdar in kata bernameya me di pêşerojê de bêtir bibe. Di bernameya me de nûçe, raporên hevkarên me (ji Stockholm, London, Stenbolê û bajarine Awûsturalyayê), bernameyên bi pirsa bicihbûna li Awûsturalyayê, agahdariyê û perwerdariyê ve eleqedar û muzîk hene

**Tu nûçe û bernameyan çawa amade dikî û karê pêşkêşkirina bernameyên radyoyê çawa dibînî?**

– Dezgeha radyoya SBS'ê navendeke xwe ya nûçeyan heye. Piraniya nûçeyên me ji ajansên nûçeyan yên biyanî û Awûsturalya tênê girtin, wekî AFP, AP, Reuter, AAP'ê û çaviyên (çavkanî) SBS'ê bi xwe. Em dikarin nûçeyên xwe herwiha ji çaviyên kurdî jî bigirin, bi şertê ku ev nûçe zû hatibin ragihandin, bi propagandayê ne dagirtîbin û ji çaviyên berpirsiyar bin, (bi nivîs yan bi deng.) Bernameyên me li gorî prensîbên rojnamevaniya objektîv û profesyonel divêt werin amadekirin û pêşkêşkirin. Nûçe û bernameyên Dezgeha SBS'ê, bi çi zimanî bibin bila bibin, divêt li gorî rêberî û bendên SBS'ê werin amadekirin û xwendin. Xwebêja (maneya) vê ne ew e ku Dezgeha SBS'ê, wekî dezgehine li Rojhilata Navîn, otorîteya xwe ferz dike, yan propagandaya Awûsturalyayê dike. Na. Li gorî prensîbên SBS'ê û rojnamevaniya profesyonel, rastî pêkan e (îmkan heye) hin caran du aliyên xwe hebin; divêt ji bo herdu aliyan fersend bête dayîn, da ku bikaribin ya xwe bibêjin; rojnamevanî jî vê yekê divêt. Ew divêt li herdu aliyên xwe binihêre. Li milê din, bendên rêberiya SBS'ê rê nadin ku bernameyek, em bibêjin wekî ya bi zimanê erebî, ku filistîniyan bike "şehîd" û cihûyan bike "leşkerên hov", ne jî rê dide bernameyeke ku em bibêjin wekî ya bi zimanê ibrî, ku ew leşkerên Îsraîlê bike "şehîd" û ereban bike "terorîst". Li milê din, li gorî vê felsefeyê, eger bernameya bi zimanê erebî fersendê bide Yaser Arafat, da gotina xwe bike, mafê berpirsiyarekî cihûyan jî heye ku li gotina Arafat vegerîne. Ev yeka ji bo partî û berpirsiyarên awûstralî bi xwe jî wisa ye.

Dema dezgehên Awûsturalyayê maf didin serokwezîr, da ku di radyo û televizyona fermî de biaxife, eynî mafî didin berpirsiyarê muxalefetê jî, herwiha rê didin berpirsiyarên partiyên biçûk di parlemanê de. Ev ji bo pirsên derve jî wisa ye. Wek mînak, sala borî dema di navbera Awûsturalya û Malêzya de hindek gelş hatin holê, weşan û dezgehên Awûsturalya rê didan berpirsiyarên malêzî jî, da ku bikaribin gotina xwe li hemberî ya berpirsiyarên Awûsturalyayê bikin. Bêguman, tiştekî wisa ji bo kesine ji xelkê welatine li Rohilata Navîn ne normal e. Wekî nîşe, berî çend salan, dema berpirsiyarê bernameyeke erebî hevpeyvînek li gel balyozê Îsraîlê çêkir û di radyo de da weşandin, ew ji bo gelek kesên di nava civaka ereb de bû amanca kevir û kuçan... Ji xwe re texmîn bike, eger em li dû hevpeyvîneke li gel berpirsiyarekî kurd biçin û hevpeyvînekê li gel generalekî tirk, iraqî, yan îranî bikin, da ew jî ya xwe bibêje! Ji bo me tiştekî wisa ne yê kirinê ye, lê ji bo welatên rast demokrat, heta şeytan jî dê maf hebe li ser tuhmeta dikeve stûyê wî bersiva xwe bide. Wisa, ji bo kurdekî karkirina di dezgeheke biyan ya xwedan prensîbên serbest û demokrat de ne hêsan e.

Ez nûçeyan û piraniya gotarên di radyoyê de tên xwendin rasterast, dîrekt, pêşkêş dikim. Di destpêkê de tiştekî wisa gelekî dijwar e, lê hêdî hêdî mirov dikeve ser. Eger çi dijwarî di destpêkê de hebin, ew ne ji kêmasiya pêkanîbûna mirovê kurd, yan zimanê kurdî ye, lê tawan ya nebûna dezgehên perwerdekirina bi zimanê kurdî ye. Yên xelkê ewqas sal bi zimanekî dixwînin, di xwendingeh û zanîngehan re derbas dibin û ji bo demekê xwe diceribînin da ku di karekî wisa de cih bigirin. Mirovê kurd divêt xwe bi xwe bigihîne vê radeyê. Ev jî ne tiştekî hêsan e.

**Nûçe û bernameyên radyoyê xwe bi gelek aliyên jiyanê û cîhanê ve eleqedar dikin. Gelo, zimanê kurdî têrî vê pêdiviyê dike? Gelo tu rastî çi dijwariyan hatî?**

– Ez bi pirsa dawîn dest pê bikim. Ev bûn dora 12 salan ku ez li Awûsturalyayê bernameyên radyoyê pêşkêş dikim. Destpêk gelek dijwar bû û ne profesyonel bû. Lê îro, eger bernameya me ji çi bernameyan ne baştir be, ez bawer nakim ji yên din xerabtir be jî, bi kalîte û zimanê xwe. Hertişt dikare bi xibreta rojane, bi mentiq û bi xebatê bi pêş ve biçe. Divêt mirov ji karê xwe hez bike û serê xwe piçekî biêşîne. Eger çi kêmasiyên bernameya me hebin, ew bi tiştine



ɒeşa kurdî Şahînê B. Soreklî ji 12 salan ve
ıî pêşkêşî guhdaran dike:

# IYAN NE ÇI KÊMASÎ YE'

ve eleqedar in ku çareserkirina wan ne bi destê me ye. Wekî nîşe, em bi piranî hîn muzîka xwe ji kasêtan digirin, bernameyên din îro bi piranî ji dîskên lêzerê digirin; ji bo bernameyên din ewqas materyal li holê ne, wekî şanoyan, bernameyên zarokan û materyalên din, lê ji bo me eger çend tişt hebin jî, ew bi piranî bi pirsa têkoşîna neteweyî ve girêdayî ne ku em nikarin di bernameya xwe de bi kar bînin; bernameyên din dikarin peywendiyê li gel dezgehên radyoyê yên welatên din rasterast girê bidin, lê ji bo me çi dezgehên fermî yên gihîştinî vê radeyê li Kurdistanê nîn in.

Niha, em werin ser zimanê kurdî. Berî ku em behsa zimanê xwe bikin, werin em bala xwe bidin zimanên wek yên farisî, tirkî, maltî... Li gel kuvan zimanan, wekî mînak, xwedan dewlet in jî, ew hîn bi bêjeyên biyanî dagirtî ne. Ji lewre, bikaranîna peyvên biyanî di zimanê kurdî de, di rewşa îro de, ne çi kêmasî ye. Divêt em bizanibin, ku di cîhana me de, heta di zimanekî wekî îngilîzî de, salê bi sedan, heye ku bi hezaran, bêjeyên nû tên afirandin. Hema bala xwe bide peyvên wek satellite, fax, microchip, laser, electronic data, telecommunication, direct telecast, microwave, nuclear medicine... Eger ji bo kurdan xwendingeh, akademî û zanîngehên neteweyî hebûna, van dezgehan dê ji bo tişt û têrmên nû bêjeyên bi zimanê kurdî biafirandana, lê di rewşa îro de çi dezgehên wisa li holê nîn in, ne jî, ji mafê kesekî, yan komekê ye ku bi serê xwe ji neteweyeke li dora 30 milyon mirov re bêjeyên bi carekê ji nû ve biafirîne. Divêt em mentiq bi kar bînin û peyvên wekî "faks" û "satelît" di zimanê xwe de bi kar bînin. Van peyvan ji aliyê piraniya gelên xwedan dewlet jî, bêyî guhertin têne bikaranîn. Talûke ew e, ku her yek ji me li gorî kêfa xwe bêjeyan biafirîne. Bi ya min be, ez baştir dibînim ku mirov peyvên bi zimanên din ji bo niha bi kar bîne, li şûna ku her kesek, yan her komek, li gorî dîtina xwe peyvên nû biafirîne.

Lê divêt ji bîr neçe ku zimanê me ne zimanekî belengaz û bêjekêm e. Pir caran em bêjeyên biyan bi kar tînin, ji ber ku me hay jê niye ku di kurdî de bêjeyek heye ku dikare şûna ya biyanî bigire. Wek mînak, em bêjeya "plan" di gelek nivîsarên xwe de bi kar tînin, lê bêjeya kurdî "tevdêr" dikare bi hêsanî şûna "plan"ê bigire. Ji aliyekî din ve, divêt mirov bikaribe bi mentiq karê xwe bike. Dema xwendina nûçeyan, heye ku mirov rastî hevokeke wisa were: "long distance missiles were bought by Iraq." Ev hevok dikare bi kurdî wisa were xwendin û fêmkirin: "Raketên amancdûr ji aliyê Iraqê ve hatin kirîn." Çi peyvên nû nehatin afirandin, lê di eynî demê de xwebêja hevoka îngilîzî hate ragihandin.

Di her bernameyeke me de 15–20 deqe nûçe hene. Em hewl didin zimanekî paqij û radeyekê standard bi kar bînin. Di nava guhdarên me de kesên ji hemû beşên Kurdistanê hene. Em hewl didin bi zimanekî wisa nûçeyên xwe pêşkêş bikin, ku her mirovê kurdiya xwe baş be, bikaribe têbigihe. Di zimanê bernameya me de bêjeyên ji zaravayên cuda têne dîtin. Bêguman, em nikarin di bernameyeke heftane de hemû guhdarên ku kurdiya wan ne ewqas çak e fêrî kurdiyeke baş bikin, lê em di wê baweriyê de ne, guhdarekî bi zimanê kurdî dizane, eger hefte bi hefte guhdar bike, ew ê li dû kurtedemekê bi hêsanî bernameyên me fêm bike. Wekî nîşe, ewê tê bigihe, ku têgihîştin fêmkirin e; pejirandin qebûlkirin e; dahatû pêşeroj e; zarok minal e; nûçe peyam e, deng û behs e; pêkanî îmkan e; keştiya noqvan gemiya binav e; axaftin şorkirin e; mezin gewre ye;... ewê herwiha tê bigihe xwebêja termên di kurdî de nû, wekî, "mafên homoseksuelan", "ragihandina bi satelîtê" û "xwepaşvekişandina Wezîrê Hêza Noklêrî ji karê xwe"... Bi kurtî, jiyana zimanan di destê mirovan de ye û eger zimanek pêşve neçe, tawan ne ya wî zimanî, lê ya axifgerên wî ye. Li gel ku ferhengên me hîn bisînor in û çiqas dijwarîne li holê bin jî, zimanê kurdî dikare bi hêsanî bi rola xwe ya ji bo radyoyê rabe. Ew kesê ku carekê guhdarî li bernameyeke dezgeheke radyo bike û bibêje, "wele bavo, ev wekî me qise nake; ez tiştekî jê fêm nakim" wê demê gelş ne ya zimên, lê ya guhdêr e. Ji bo xwendina rojnameyekê jî wisa ye. Mirovekî ku xwendina kurdî ji bo wî nû ye nikare hema rojnameyeke kurdî rake û mîna avê pê de biçe. Divêt li nik wî sebir hebe, carekê û duduyan û sisiyan bi israr hewl bide, da ku bikaribe bi ser keve û ji xwendinê sûdê bigire.

**Li Awûsturalya çiqas kurd hene; weşana radyo ya we digîhe çiqas kesî?**

– Ferq di navbera "çend kurd" û "çend kesên bi kurdî dizanin" de heye. Di nava guhdarên me de kesên aşûrî/siryanî û ermenî jî hene ku bi kurdî dizanin. Li milê din, gelek kesên kurd hene, ku mixabin, bi kurdî nizanin. Hejmara kurdan li Awûsturalyayê bi şêweyeke zelal nediyar e. Kurdên li vir ji 6 welatên cuda tên (Lubnan û Komarên Yekîtiya Sovyetî ya berê tê de). Bi texmîna min, hejmara kesên bi kurdî dizanin belkî li dora 5000 kesî be ku piraniya wan li Sydney û Melbornê dimînin. Weşîneke me digîhe herdu bajaran jî. De îcar çend kes ji wan guhdar dikin, ez nizanim. Wisa bawer im, kesên bi kurdî dizanin yan meraqa xwe li ser kurdî hene, kesên hez dikin nûçeyan û agahdariyê bi kurdî bibihîzin, guhdariyê li muzîka kurdî bikin,.. guhdar dikin. Ta ji dest tê, em hewl didin bernameyên bi kalîte ji bo guhdaran pêşkêş bikin û guh bidin pêşniyariyên bi mentiq. Eger mirovekî bi zimanê kurdî dizane li welatekî wek Awûsturalya jî nexwaze guhdariyê li bernameyeke bi zimanê kurdî bike, me maf niye bibêjin, bila îleh guhdar bike.


**Kurdên li wir ji weşanê çiqas memnûn in?**

– Eger yek berpirsiyarê radyo an jî yê rojnameyê be, bêguman ew hêvî dike ku hemû guhdar yan xwendevan memnûn bin, lê razîkirina hemûyan ne tiştekî pêkan (mumkun) e. Bi dîtina min, ew bernameya ku herkes jê memnûn be tiştek tê de kêm e. Karê birêvebirina bernameyeke bi zimanê kurdî, li welatekî wekî Awûsturalyayê, di dezgeheke wekî ya SBS'ê de ne karekî hêsan e. Ji aliyekî ve axifgerên (spîker) zaravayên cuda, piştgirên partiyên siyasî, têkoşîna gelekî bindest, propagandaya ajîtasyonê; li milê din, pêwistiya rêzgirtina ji hestên civakên din re û guhên dewletan; herwiha berpirsiyariya li hemberî dezgehê, qanûnên welêt û karê rojnamevaniya objektîv... Memnûnkirina herkesî di bernameyekê de zor dijwar e, lê ez hewl didim ku bi berpirsiyarî û mentiq bi karê xwe rabim, heta pir caran li dijî meraq û hestên xwe jî. Bername ne ya bîr û baweriya min ya şexsî ye, ne jî ya têkoşîna gelê kurd e, lê bernameyeke bi zimanê kurdî ye, di dezgeheke fermî de, li Awûsturalya. Ev hemû li aliyekî, li aliyê din, deriyê bernameyê ji her guhdarî/ guhdarê û ji her rêxistinê re vekiriye, bi şertê ku rêza wan ji bend û rêberiya dezgeha SBS'ê û qanûnên Awûsturalyayê re hebe.

Herkes dikare tê de gotarên xwe bixwîne, berpirsiyarên rêxistinan dikarin di hevpeyvîn û munaqeşeyan de beşdar bibin û dîtinên xwe diyar bikin, komele dikarin danzanînên xwe tê de bidin bihîstin.... Ji bo bidestxistin û pêşvebirina vê bernameyê gelek xebat hatiye kirin. Divêt mirov bi berpirsiyarî bi karê xwe rabe. Dezgeha SBS'ê li cîhanê yeke bêhempa ye. Armancên wê mirovîn in. Di bin saya televizyon û radyoya SBS'ê de Awûsturalya gavên mezin di pêşvebirina pirçandiyê, toleransê û aştiya di navbera komên etnîk de avêtine. Serbilindî ye ji bo me hemûyan ku bernameya bi zimanê kurdî jî yek ji bernameyên vê dezgehê ye. Dixwazim li vir bibêjim, ku televizyona SBS'ê jî, ji bo danasîna kurdan û têkoşîna wan, li Awûsturalyayê roleke mezin lîstiye. Di adara dahatû de, wekî nîşe, ew ê fîlma Nizamettin Ariç "Kilamek ji bo Beko" û fîlmeke dokumenter li ser kurdan raber bike.

**Hevpeyvîn:**
**SUUT KILIÇ**

# ÇIYA DÎSA GERM DIBIN



## Li çar aliyên bakurê Kurdistanê bi taybetî li çiyayên Gabar û Cudî şerê di navbera hêzên ARGK'ê û Artêşa Tirk de her diçe gurtir dibe

**Bi hatina biharê çiya germ dibin. Bi taybetî li dora çiyayê Gabar û Cudî şerên giran qewimîn. Hezên dewletê roja 20'ê reşemiyê dest bi operasyoneke kir, wan dixwest van herdu çiyan ji destê hêzên ARGK'ê derxin, lê operasyon negihîşt armanca xwe, li hemberî livbaziyên gerîla têk çû.**

Îsal li Kurdistanê zivistanê jî şer dewam kir. Li gelek deveran di şerê navbera gerîla û hêzên dewletê de gelek kes hatin kuştin, hêzên dewletê li hemberî êrîş û kemînên gerîla gelek zayiyat dan û ji bervê yekê wan jî berê xwe dan gel. Çapemeniya tirk xwe li hemberî van bûyeran xwe li keriyê danî, bitenê daxuyaniyên waliyê herêmê weşandin.

Bi nêzîkbûna biharê re hêzên dewletê dest bi operasyonên dorfireh kirin. Li Serhedê ji 20'ê rêbendanê bi hêzeke mezin operasyonê 33 rojan dewam kir, lê wan nikaribû xwe bigihînin hêzên ARGK'ê. Li aliyê din operasyonên li herêma Botanê rastî berxwedana hêzên gerîla hat. Hêzên dewletê bi mebesta ku bikevin çiyayên Cudî û Gabarê, wan deran ji bin kontrola gerîla derînin roja 20'ê reşemiyê dest bi operasyonê kirin. Piştî du rojan wan li hemberî êrîş û kemînên hêzên ARGK'ê debar nekir, xwestin ji Gabarê vekişin. Di dema operasyonê û dema vekişînê de gelek zayiyat dan. Li vir gerîlayan helîkopterek xist, zêdetirî 20 leşkeran jî di şer de hatin kuştin. Operasyona Cudî li hemberî liberxwedana gerîla bi ser neket, li wir jî gelek zaiyatên hêzên dewletê hene.

Tevî operasyonan jî li gorî agahiyên herêmê û yên Kurd-A'yê livbaziyên gerîla ji Dêrsimê heta Botan li seranserê Kurdistanê dom dikin. Wek mînak roja 19'ê reşemiyê li başûrê Mûşê di navbera gerîla û leşkeran de şer derket, di vî şerî de 3 leşker û 2 gerîla mirin. Dîsa di 21'ê reşemiyê de jî li herêma Merdînê gerîlayan kemîn danîn pêşiya hêzên dewletê ku derketibûn operasyonê, di şer de serbazek, 2 çawîşên daîmî (uzman çavuş) û 9 leşker mirin, tu zaiyatên hêzên gerîla çênebûn. Li Dêrsimê roja 22'ê reşemiyê gerîla êrîş bir ser artêşa taybet ku li gundê Îştexê yê Malkîşê (Çemişgezek) bi cih bûbû. Li vir 3 serbazên vê artêşê hatin kuştin. Li ser riya di navbera Nisêbîn û Cizîrê de gerîlayan 2 panzer xistin kemîna xwe, herdu panzer îmha bûn, di vê bûyerê de 21 leşker hatin kuştin.

Ev bûyerên di nava hefteyekê de rewşa şer baş diyar dikin. Dema mirov baş li van livbaziyan binêre texmînkirina şerê biharê ne dijwar e. Jixwe daxuyaniyên qumandarên gerîla jî didin zanîn ku ev bihar wê ji yên din cuda be. Agahiyên ku çavkaniyên herêmî didin bi agahiyên çapemeniya tirk ji waliya herêmê distînin hu çap dikin re li hev nakin.

Vê hefteyê hêzên dewletê li dora çiyayê Gabar û Cudî operasyonên xwe domandin. Armanca hêzên dewletê, ketina herdu çiyan bû. Li hemberî van êrîşên hêzên dewletê, gerîlayên ARGK'ê li gelek deverên quntara çiyayan kemîna avêtin pêşiya leşkeran û destûra ketina çiyayan nedan. Li quntara herdu çiyayan jî şerên dijwar didomin.

**Di heftiya dawî de roj bi roj bûyerên ku qewimîne ev in:**

**23.2.1995**

Hêzên dewletê li quntara çiyayê Gabarê dest bi operasyonekê kirin. Gerîlayên ARGK'ê ji gelek hêlan ve êrîşî leşkeran kirin. Di êrîşên gerîlayan de 3 leşker mirin, gelek ji wan birîndar bûn.

Li quntara çiyayê Cudî gerîlayên ARGK'ê rê li ber operasyona hêzên dewletê girtin. Gerîlayan li gelek deveran êrîşî leşkeran kir. Der heqê zaiyatên leşkeran de agahî tune ne.

Li başûrê Mûşê, di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di şer de 3 leşker û 2 gerîla mirin.

Hêzên dewletê li Edene û Osmaniyeyê li ser Kurdistaniyan cerd û pekutiyan dikin, gelek Kurdistanî hatin binçavkirin.

**24.2.1995**

Hêzên dewletê li Serhedê operasyonên xwe sekinandin. Operasyonan ji 20'ê rêbendanê û bi vir ve dom dikir. Di operasyonan de di navbera gerîla û leşkeran de tu şer derneketin.

Gerîlayên ARGK'ê li Mêrdînê li du milan kemîn avêtin pêşiya leşkerên ku derketine operasyonê. Di milekî de gerîlayan serbazek, 2 çawişên daîmî û 9 leşker kuştin. Li milê din di kemîna gerîlayan de 2 leşker mirin, gelek leşker birîndar bûn. Greîlayan tu zayiyat nedan.

Gerîlayên ARGK'ê êrîşên xwe yên li çiyayê Gabarê didomînin. Di êrîşên gerîlayan de 15 leşker mirin, gerîlayan dest danîn ser gelek cebilxaneyî.

Artêşa taybet li Malkîşa Dêrsimê, li gundê Îştexê kete kemîna gerîlayan. Di kemînê de 3 astsubay mirin, gerîlayan dest danîn ser gelek cebilxaneyî.

**25.2.1995**

Di çiyayê Gabarê de şerê di navbera gerîlayan û leşkeran de nasekine. Li gelek deveran di navbera gerîlayan û leşkeran de şer derket. Di van şeran de gerîlayan helîkopterek xist. Der heqê mirî û birîndaran de agahî neketin destê me.

Gerîlayên ARGK'ê li Midyadê, li gundê Dalila cerdî ser cerdevanan kir. Cerdevan ji ber êrîşa gerîla reviyan. Gerîlayan depoya avê bombe kir, depo tehrîp bû.

Di 23'ê reşemiyê de gerîlayên ARGK'ê hêzên dewletê di riya Nisêbîn û Cizîrê xistin kemîna xwe. Di kemîna gerîlayan de 21 leşker mirin, 3 leşker birîndar bûn. Gerîlayan di kemînê de zayiyat nedan.

Piştî derketina zozanan, derketina mêrga jî tê qedexekirin. Li gundên Êlihê Ermiye, Receban û Tilmisê hêzên dewletê nahêlin ku gundî pezên xwe derînin çira mêrgê.

**26.2.1995**

Li quntara çiyayê Cudî şerê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de didome. Li mintiqeya Bilika gerîlayan avêt ser leşkeran. Di cerda gerîlayan de 17 leşker û 6 gerîla mirin.

Koçerê navçeya Hezoyê yê li gundê Girê Kelo ji ber pêkutî û cerda cerdevanên Berzana Jorê ji gund koç kirin. Hêzên dewletê û cerdevanan dest danîn ser gelek tiştên koçeran.

**27.2.1995**

Di navbera Sason, Hezo û Farqînê de, di navbera gerîlayan û leşkeran de şerên dijwar didomin. Li gorî agahiyên ku ketin destê me di van şeran de 3 gerîla û gelek leşker mirine.

Li navenda navçeya Gevera Culemêrgê, tîmên bajêr yên ARGK'ê santrala telefonê îmha kirin.


Hêzên dewletê bi balefiran bakurê Liceyê bombe kirin. Di bombekirinê de gerîlayan zayiyat nedan. Der heqê mirî û birîndarên sivîl de agahî tune ne.

**Jêrenot:** Di hejmara me ya 15'an de li gorî agahiyên ku ketibûn destê me 7 gundî (Bayram Özkan, Mehmet, Hacı, Mahmut Güneş, A.Kadir Dayan, Abdullah Sevgin) ji aliyê gerîlayan ve hatibûn revandin. Sebebê vê yekê jî wekî alîkariya bi dewletê re hatibû nivîsandin. Piştî bûyerê agahî kete destê me ku ew kes ji ber sedemê birîndaran ji aliyê gerîlayan ve hatine girtin. Gerîlayan cezaya pereyan dane van kesan.

**Welatê Me/Kurd-A**

---

**CENGİZ ALTUN**



**Ji wan kirî rastî tê kuştin**
**Ji wan kirî bawerî tê fetisîn**
**Ji wan kirî şop nayê ajotin**
**Ji wan kirî tu mirîyî Cengiz**

Di salvegera şehîdbûna te de (24.2.1992) em we hemûyan bi bîr tînin û bizanibin riya ku hûn tê de çûn, niha ne bêrêwî ye.

***Li ser navê malbata wî***
***Sebahat û Hayrettin***

# WARÊKO KON

Ripelanî Welatê Me di şima rastî Darrêz amê. Û miheqeq zî yî balî/dîqatî şima ancito. Darrêz çi to? Yeno çi vate? Şima aşkenî vajî ku ma namê bî qat in merdom Darrêz pê kar ano. Beno ku tikîn verî zî raştî vatêko ina nêwîn amê. La rênê zî ez wazena vatê Darrêz akerî.

Namê yi ser zî eseno ku Darrêz di vatona amo viraştiş: Dar û rêz. Ez hema vajî ku wa şima şibhi de nê(î)manî (mi "î" girot myanti di xetan, çimku cê ma de vanî "nîmanî". Yanî helindê "ê" de "î" yeno vatiş. Ku şima bizanî.) Vatê Darrêz mi xwi ver nêviraşto. Cara esto. Cê ma di cêk esto nami yî Darrêz o. Darrêz myantê dew û warê ma do. Riyê warî myantê Darrêz re şino û yi keno di qeflê/parçê. Qeydo ku vatê Darrêz amo viraştiş, qeydeko normal o. Kurdî di zî, zonanî bînan di zî zaf vatê in qeydi amê peydakerdiş. Exlebi/e namê ciyan in qeyde peyda bî. Vatê Darrêz di namana amo viraştiş. Dar û rêz; wirdî zî namê. Zonî rojane de ma vanî "darî rêz". Yanî wexta ku ma raştî daranî rêz bî, ma vanî darî rêz. La in qeydêko bîno. Ez mînakêka (mîsal) bîn zî bidî wa ina mesela bikwero ca.

Aya zî serî "Xwezla" wa. Cê/o ma di gelî (kurmanc vanî) esta, ca vanî Xwezla. Vatê Xwezla di di namê estî. Xwez û la. Xwez bi kurmancî beraz o. La zî newal a. Te ra aw şina. Labelê in namê (zê Darrêz û Xwezla) çi qeydi amê viraştiş? In der heq di îdê û teorî zaf î. In warî di zaf çî amê vatiş û nuştiş. Pisporî in warî zî zimanzanî. Yi kokî vaton û hevokan dima gerênî. Madem ko qisi serî Darrêz sero, ez wazena qeydê famkerdiş xwi biyarî zon. Bi xwi în qeydi ruhî zon û fikirî ma ra durî zî no/û. Teorî gerayişî.

Çi to teorî gerayişî? Ina mesela derg a, la ez kilm birnena. Ma zanî ku dinyê ma verî zê erînê bî. Verî erd hîra bi, merdom tay bî. Labelê jiyan yin zê ê ma nê bi. Ma qeydê koçertî zanî. Koçeran rê warêko daîm çi no. Erî ita de, rojeko bîn cênê di. Wextanî verî di zî civateko rûniştî çinê bi. (Bîbo zî ay civat bi xwi mecbûr bîn cê xwi bedelnên. Hemu nê bi zî tikîn.) Merdoman qê nan û awê xwi û sedemanî bînan -zê dibendiyê myantê xwi- zaf cê bedelnên. Ma vaji co ku te di nên ru, werdiş yin biqediyê, cêko newl û ê verî dewlemendtir dîn. Aw wext cê xwi wo newi xwi rê kerdê wari. Ê helbet wexta merdom cê bedelnê, raştî ci(o)yanî newan zî yeno. Erd new o, dar û ber, vaş, qirş û qal newo. Heger ca xirxalî bû, lazim ku namanî newan bidî ci. Yan namê ku xwi dir ardî (heger bibî se) nanî pa yan zî hewl virazenî. Heger newi virazî çîwo rast awa ku banî xisusanî tebîeti re. Yanî oja de çi esto û zaf çim dano. Beno ku raştî merdomanî bînan zî byerî. Awçax demek ku raştî kultirêko newi amê. In rewş de yan danî yovîn û yovîna genî yan zî o ku bi qiwet bo o geno, kultir ay bi qiwetî tesîrê ê bînî keno.

Ma bî/beyî serî Darrêz. Qeydo ku yeno mi vîr Darrêz rastî zî cêko rind û weş do. Tebîet yi zaf dewlemend o (nuştişêko bîn de ez wazena çî ku Darrêz de beno pîl, la ra kerî). Heger raşt bû, Darrêz wextanêk bajarî Ermeniyan bû. Bi xwi kiştê Darrêz di girêk esto ca vanî "Keleşkê Darrêz". Ita di xirbî kanî bîbî. Verî ku dewijanî ma dewê xwi kerdibî ava (amayiş kurdan a dewê binî Darrêz 200 ser încex esto. Dewijî ma zafî yin Mûş û Amed serî amêbî), ita de Ermenî jiyên. La wexta dewijî ma amêvî, ita veng bi. Ermeniyan verî yin ita terk kerdibî.

Erdî Darrêz awi wo û darî mêwê kûvî te de zaf î. Ika zaf darî birnê, verî merdom gurbayiş yi re tersên, xof girotên. Wexta ku dewijî çim ginênî ita, ewilî daranî mêwî vînenî. (Cê ma de daranî mêwî re zî vatên darî rêz). Aw wext aha Darrêz (darî rêz), vanî. Ez inê otîr qebûl kena ku dewijan him darî şinasnên him zî mêwi/rêz şinasnên. Xwi otîr nêbo bingehî teorî ma zî beno pûç.

MEMO DARRÊZ

## KELEPOR

### Çawa nivîskarên kurd li Swêdê dibin mehmetçîk?



DILBIXWÎN

Dîsa, piştî demeke dirêj ez li Swêdê me. Belkî we Swêd dîtibe, li wir di hefteyekê de çar–pênc pirtûkên bi kurdî derdikevin, tîraja wan incax xwe digihîne 200–300 taneyan. Bi Nizamettin Toğuç re emê li Swêdê konferanseke fireh ji gelê xwe re, li ser Parlamentoya Kurdistanê ya Surgunê li dar xînin.

Li Swêdê sekreterên partiyên kurdî dijîn, mixabin hinekan ji wan dikanên pîzzayê vekirine, hinek jî di mala xwe de bêhêvî û moral mane, rewşa nivîskarên kurd li Swêdê ku me carekê di rojnameya Welat de li ser wan nivîsandibû, bi nexweşiyeke girantir ketine. Ecêbmayî nemînin, nexweşiya ku ew di navê de ne, ji nexweşiya çapkirina pirtûkan jî dijwartir e. Meraq nekin ezê ji we re bibêjim.

Bêguman haya we ji Kurdistanê heye. Her roj gundên me dişewitînin. Însanên me dikujin, destdirêjiyan li ser namûsa keç û jinên me dikin... şer e, di şer de tu bêdeng bimînî, tu qir dibî. Nivîskarên ku li Swêdê xwe kurd dibînin û her roj dersên welatparêziyê û xwedîderketina li Kurdistanê di kovar û rojnameyan de didin, tu caran li hemberî şerê azadiyê bêdeng namînin, eşkere mêraniya xwe nîşan didin, çi dikin? Dibin mehmetçîk! Ev tenê ne bes e, bi ser de 50.000 kronên Swêdî jî (278.650.000 TL) wekî alîkariyê didin hikûmeta Tirkiyeyê.

Em çi navî li vê rezaletê bikin?

Kesekî ku çûye eskeriyê (ew berê serokê federasyona kurdî bû, li Swêdê) di radyoyeke lokal de (pencere) xwe wisa diparêze: "Heqê kesekî nîn e ku vî karê ku ez pê rabûme, sûc bibîne, tiştekî normal e, herkes dikare pê rabe. Min bêriya diya xwe kiribû... Ji bîr nekin ez serokê rêxistineke kurdî bûm, welatparêz im... Devê xwe bigirin, ezê pozê we bişkînim..."

Belê, baş bû ku we lê guhdarî nekir, wê mehmetçîkê qehreman Keya Îzolî pozê we jî bifiranda.

Li vir ez dixwazim tiştekî bibêjim; eger leşkeriya ji Tirkiyeyê re û cihgirtina di nava mehmetçîkan de welatparêzî be, wê demê hemû welatparêzên xwediyên şehîdan, gerîla û girtiyên di zindanan de, yên li ber xwe didin, xayin in. Heke ne wisa be, ku ne wisa ye jî, yên li ber xwe didin, ji Kurdistanê re dibin qurban û çeka şerefê hildigirin welatparêz in, ên ku diçin kumê mehmetçîkan jî didin serê xwe û serê sibê "Ne mutlu Türküm diyene" bilind dikin jî, ne welatparêz in, ji kerema xwe re hûn navekî li wan bikin, çi ne?

Kî bi vî karî re radibe? Dîsa cih Swêd e, yên pê radibin jî rewşenbîr û nivîskar in.

Ev cure kurd kî ne? Alîkariya şoreşa xwe nakin, di nava welatparêzên bişeref û namûs de cih nagirin û ne pêncî, pênc hezar kron nadin tevgera azadiya Kurdistanê, ne di şer de, ne jî di aştiyê de xwedî li tiştekê dernakevin, wê demê hûn çawa destûrê didin xwe ku bibin serokên federasyon û rêxistinên kurdî?

Mirov ecêbmayî dimîne! Tu pirtûkên wan dema ku dixwînî, tu Kurdistana mezin, şoreş û azadiyê tê de dibînî. Ev durûtiyek e, pênûsa durû jî tu caran nikare li ser Kurdistanê gotineke rast bibêje.

## Rewşen: Derket û hate berhevkirin

Hejmara nû ya Rewşenê hate berhevkirin. Kovara Navenda Çandê ya Mezopotamyayê ku ji du mehan carekê dertê, ji ber nivîseke bitirkî ku der heqê zimanê kurdî de ye, hate komkirin.

Nivîs ji aliyê Şareza Aver ve bi navê "Kürt Dili ve Lehçelerinin Coğrafik Dağılımı" (Zimanê Kurdî û Belavbûna Zaravayên we ya Cografîk) hatiye nivisîn.

Rewşen, di nivîsa "Sergotar"ê de dide zanîn ku ji ber gelemşe (problem) yên aborî hejmara dawîn bi derengî derketiye. Lewre ji xwendevanên xwe dixwaze ku li kovarê xwedî derkevin.




Hejmara dawî ya "Rewşenê"

Hejmara dawîn wekî du hejmaran (18-19) derçû û tê de nivisên celeb bi celeb cih digirin. Ji çîrokan "Vejîna Teralekî" ya Berçem Eksen, "Heyfgirtina Keçika Biçûk" a Tevfîk Jêhat, ji helbestan re, "Çend Raman"a Hesen Zinar, "Serpêhatina Dayikakê" ya Halil Kurt, ji nivisên şiroveyî û zanîstî re "Li Rojhilata Navîn Afirandina Dirokê" ya Mahmut Yıldız, "Bandora Pergalên Ragihandinê" ya Şevin Civaknasê dikare nolî mimûne bê dayîn.

## HEYE GELEK

Li quntarê Mezopotamyayê, heye gelek
dinale
nalîna wî biêş e
geş dibe tê de evîna sor wekî giyanê.

Li vir;
dişewitin dar û ber
gund û bajar kavil dibin wekî komira
febrîkayan
bêxewn in mirov ji talanê
bi hostatiyê tê jahrkirin av û xwelî

Şekl û rûçikê wan çi ye?
diaxivin wekî derwêşên bihuştê
keratî ye muxa dengê wan
hebûna xizanan jî wan standine, kepaze ne
tênebok û çilek in kelemçe li devan xistine,
ne ziman e ne çand,

Li vê derê kelegirî ne kes
ka li ku ne yên diçemilin kendalê bi kindir
heye gelek li ber lingê Cudî
deng li aştiyê dike
kefen lixwekirine jindarên gerdûnê,
li erdê nemaye hêvî
ka hîv?

MEMO DARRÊZ

www.arsivakurd.org

Li ser bûyerên dawîn me hevpeyvînek bi xwendekarekî Zanîngeha Marmarayê re çêkir:

# 'EMÊ BIHUŞTÊ LI SER RÛYÊ ERDÊ AVA BIKIN'

**Em naxwazin dengê me bi şer û pêvçûnê bilind bibe, heta niha tu caran şîdet ji me nehatiye, me tu caran bêsebeb destê xwe nedaye faşîstekî û me tim hewl daye ku xwe biparêzin. Bes ew ji her alî ve bi ser me ve tên, îdere, polîs û ülkücü giş bi hev re têne ser me.**

**Hûn dikarin xwe bi xwendevanên me bidin nasîn ?**

– Navê min Taylan Özgür Akan e. Ez li Zanîngeha Marmarayê di beşa tibê, di pola (sinif) duyemîn de dixwînim.

**Hûn dikarin der heqê bûyerên dawîn yên li dibistanan diqewimin, çi bibêjin?**

– A rast ev bûyerên bi vî rengî ne nû ne, ev ne meseleya hefteyekê, mehekê yan du mehan e. Ji destpêka sala 1994'an bi vir ve ev tişt diqewimin. Car caran mirov lêdanê dixwin, tên revandin. Lê belê hefteya çûyî (roja 22'yê mehê) vê bûyerê bala medyayê kişand ser xwe, deng veda. Mirov hinekî veciniqîn, ji hev pirsîn ka li zanîngehan çi dibe. Kesên ji bûyeran mesûl ülkücü ango nijadperest in. Piraniya wan ji dibistanê ne, lê ji derve jî dikevin nava dibistanê, ji ber ku polîs wan wekî hacet bi kar tînin. Lewma li gorî dilê xwe, bi her cure sîleh (kêr, sator, çek, molotof û hwd.) dikarin têkevin hundir. Di berîka van kesan de kartvizîtek heye, nayê zanîn ka kê ev daye wan, lê dema ew wê kartvizîtê nîşanî polîsan didin bi serbestî dikevin hundir. Ev kes tenê berê xwe nadin kesên sosyalîst û demokrat, şîdetê li ser hemû mirovên nejiwan bi kar tînin. Mînak di bûyera roja çarşemê de kesên li qantînê bûn ji baweriyên cur bi cur bûn. Li wir mirovên sosyetîk, ji ANAP, DYP'ê jî hebûn. Ew mirov şîdetê pir bi hovane bi kar tînin, gelek hevalên me birîndar bûn, ji van du kes ji ber derbên ku hatibûn serê wan, ji xwe çûn. Divê bê gotin di dema êrîşa van kesan de polîs ji holê winda dibin, piştî ku me ülkücü qewirandin, îcar polîs êrîşê tînin ser me. Roja înê (24'ê reşemiyê) protestoyek hate lidarxistin, li vir du kesên faşîst dîl hatin girtin, di destê wan de kêr hebû, ji van hate xwestin ku ji hemû xwendekaran lêborîna xwe bixwazin. Piştî ku wan lêborîna xwe xwest jî, bêyî ku sîleyekê bixwin, hatin berdan. Lê polîsan êrîş anî ser hevalê me yên ku ji bo protestoyê rûniştibûn û bi awayekî nemirovî ew girtin bin çav.



Xwendekar pêşî ji faşîstan pişt re jî ji polîsan lêdanê dixwin.

**Li dibistanê komeleya we heye, xebatên bi çi awayî çê dibin ?**

– Me li dibistanê di destpêka sala çûyî de bi navê 'Kulûba Çand û Hunerê ya Zanîngeha Marmarayê" saziyek ava kir. Ev sazî bi karên çand û hunerî dadiket; ji felsefeyê heta şanoyê gelek xebatên cur bi cur dikirin. Piştî vê bûyerê hinekî rengekî siyasî pê ket. Bû cihekî ku mirov li hev dicivin û tev hereket dikin. Di nava vê saziyê mirov têne ba hev, tev dixebitin, hev dinasîn û bi vî awayî tê digihîjin ku mirovên wekî wan difikirin gelek in. Hinekî ji rengê xwe yê destpêkê dûr ket, lê dîsa jî bi dîtina min wiha baştir e. Niha hêza me heye ku em her cure livbaziyê bikin.

**Ji bo ku dengê we bilind derkeve hûn çi cure xebatan dikin?**

– Em naxwazin dengê me bi şer û pêvçûnê bilind bibe, heta niha tu caran şîdet ji me nehatiye, me tu caran bêsebeb destê xwe nedaye faşîstekî û heta niha me tim hewl daye ku xwe biparêzin. Bes ew ji her alî ve bi ser me ve tên, îdere, polîs û ülkücü giş bi hev re têne ser me. Dema em dikevin hundir polîs li ser me digerin, li nasmeya me, heta li nava cuzdanê me dinêrin, polîsên çevîk li korîdorên anfiyan digerin, çavsoriyan li me dikin. Em çi dikin? Em jî yekîtiya xwe xurt dikin, piştgiriyê didin hev, li hev xwedî derdikevin, hewl didin ku xwendekarên din jî bikişînin aliyê xwe û ji bo vê yekê foruman çê dikin. Têkiliyên me bi xwendekarên Zanîngehên din re jî hene, em tevdîr dikin ku di meha avrêlê de hevkariyê di navbera zanîngehan de çê bikin. Em dixwazin tevgerekê ava bikin ku em karibin li hemberî êrîşên fasîşt bi giştî li ber xwe bidin. Divê pêşî ez vê bibêjim, em şer naxwazin, biratiyê, aştiyê dixwazin. Em dixwazin bihuştê li ser rûyê erdê ava bikin. Bes kirinên faşîstan li dinyayê û Tirkiyeyê tên zanîn, heke ew bi ser me ve werin emê bi eynî metodê bersivê bidin wan, nexwe jiyana me dikeve xetereyê.

**Daxwazên we ji xwendekarên nealîgir çi ne?**

– Em ji wan ji bo miroviyê, reaksiyoneke rûmetdar dixwazin, ji wan hêvî nakin ku rasterast tevî şer bibin, jixwe em şer naxwazin. Lê hinekî piştgiriya xwe nîşan bidin wê baş bibe. Heta niha zêde xemsar mane, reasiyoneke baş nîşan nedane.


**Bi çi dijwariyan re rû bi rû dibin, çi di sinifan de, çi li razanxaneyê (yurt) ?**

– Li sinifan tu pest û pêkutî nîn in, ji ber ku yekitiya me xurt e. Lê li razangehan pesta olperest û neteweperestan gelek e. Mirov li razangehan ji ber dîtinên xwe, bir û baweriyên xwe zilmê dibînin, rastî çavsoriyan tên. Di gel hemû dijwariyan wezîfeya me liberxwedan e. Emê qasî ji dest me bê, ji bo bipêşveçûna mirovahiyê tiştên dikevin ser milên me, pêk bînin.

**Hevpeyvîn:**
**CEWDET QUŞMAN**

Le salrojî çiwaremî serhildan da;

# Birakujî û malwêranî



Rojî 5.3.1995 tewaw çiwar sal be ser raperînî gelî kurd le Kurdistanî Başûr da der baz debêt. Ba be hev re temaşa bîkeyîn û bizanîn le mawey çiwar salî raburdû da, le sayey (destketekanî) raperîn da çon jiyawin û ta çî radeyek beşdar bûne le pêşvebirinî ew parçe azedey Kurdistan da? Bê guman ewey ke hember paşmawey rijêmî BAAS raperî û welatî azad kird tenha cemawerî gelî kurd bû, le hendê le şar û şaroçkekan da diway çend rojêk le azad bûn ewsa pêşmerge degeyîştin, hîç başûriyek ew rojaney le bîr naçêt. Her le rojanî yekemî serhildan ewe parte kurdiyekan le birî giyanî berxwedan û fidakarî miletyan han deda ke wa le derewe bigeyenin ke kurd bê parêzgarî rojawa natwanê le Kurdistan da jiyan berête ser. Encamî eweş koç û barî be milyonan kurd bû berew herdû dewletî dûjminî kurd Îran û Turkiye. Êstaş diway 4 sal lew karesat e, gelî kurd duçarî şerêkî nawxoy malwêranker bûwe. Em şer e be desîsey dûjminanî kurd le seruy hemûyan ewe dewletî turk ewe be rê deçêt. Dûjminanî kurd dexwazin hêze welat parêz û serbexwe xwazekan le başûr da dewryan nemênê be mebestî geranewey deslatî reşî Baxdad bo Kurdistan.

Êsta be başûr da şerêkî qirêj be dîhênanî ew mebestey serewe berêwe deçêt. Sûtemenî ew şereş her ew gele ye ke ber le 4 sal ser yan helda û BAAS yan le Kurdistan be der na. Katî ewe hatiwe ke newey gelî kurd be hemû çîn û tiwêjêk ewe hemberî ew şer e derkewin û nehêlin çî dî ew beş e azadey welatekeman wa bêbextane bête wêran kirin. Katî ew hatiwe ke le ser binaxeyekî neteweyetî pitew dest be xebat le pênawî serbexoyî û azad bûnî yek carekî da bikeyin. Katî ewe hatiwe ke zor be rûnî dost û dujminanî xoman binasin.

**BEKİR BAHOZ**



Serri 1976-1980
Arjantîn

FÎLMÊ VIJÎNAYE

# DÎROKA RESMÎ

**Namey film:** La Historia Official
**Y./ Sermiyan:** Luis Puenzo
**S./ Nuştox:** Aida Bortnık
**K./ Kaşkerdox:** Feliks Montı
**Muzîk:** Atilio Stampone, Maria Elena Walsh
**O./ Kaykerdoxî:** Guillermo Battaglıa, Chunchuna Vıllafane, Anlia Castro
**Welat:** Arjantîn/1985

Vîetnam, Şîlî, Nîkaragua, El Salvadorî ra pey, no hewte zî Arjantînî sero yew fîlm... Tirkiya, inî welatan ra çika dûriya, çika ferqlî ya eceba? Vazanê bêrê ma piya bewnî, Arjantîn û Tirkiya çika yewbîna manenê, çika nêmanenê... Ma wêşî durî zî nêşorê.

...Serri 1974 Serekê Arjantînî Iuan Domingo Peron, Mireno. Cenî ya iey (Isabel Peron) herunda mirdedê xwi bena serekê Arjantîn. Sarri 1976. Eskerî, 1943'a pey darbeya 6. reydê Isabel Peronî zî devirkenê.

Darbekerdoxî (cunta), 1976'ra pey, daha zaf, mêrdima, kişenê, işkence kenê, vinîkenê. Yew kinardi, milet, vayeyra, (enflasyon %300350) feqîreyra şikêna, yew cara zî hukmat, jîn pey spor (futbol) î reyda abonoz keno, xapêneno...

Cunta, seba Falklandî 1982 di ingiliz a reydê lej (herb) kena. Arjantîn lejdê veriyeno!..Tira pey mileti (karkerî, devijî talebey, roşînvîranî) îsyan kenê... Cunta, nişta daha veşî deyax biko, xwi vila kena... Serri 1982.



Sermiyan Luis Puenzo

Hewt (7) serrî mandi, 30.000 ten mêrdim vinîbeno. Hinzar a reydê mêrdim seqet maneno, kenê hepisa, zindana. Çend serrî ra pey mezeli pîlî vejiyênê orte, hergû yew mezel ra hîrsey- çarsey (300-400) ten mêrdim tira vejiyeno, jîn mandi 3-4 serrey gedey zî estî, fifing sere ra nayey.... Çend hebi kanpî hêsîr a vejiyenê orte,... De anasar yew welat ra ferqê Tirkiya çiyo şima wajê?...

Ez şima nêzana, labele mi gore yew ferq esto. O zî no yo: Arjantîn di darbekerdox ana, general ana hesap persiya... Pêro belkî hema zî hepis an dê... La generale Tirkiya? Ê korayê?.. Yew di tenî Marmaris ti kum î dê kay kenê, yew çend tenî Şîrket a sero ronişte, tay, kewtî partî ya man, ay yewer zî (Tahşin Şahinkaya)ki diz do pîlo, dinya di en zengîn 3-4 generalana yewo-bira orte di nêaseno...

Novelê na fîlm: Anasar yew wext, anasar yew welati di veyrana. Yew cenêki, inî hindasî çiyana bêxeber, may û pî yew geda (seyeki) geyrena... No beyntardi hale welatê dê xwi, hale miletta xwi tikeyna rînd veynêna... Mesela may ay hindasî vinîbeyaya, hewte di ray (rojo sift) yew meydan (meydanê vînîbiyaya) di, resman dê eylandê xwi reydê top benê pêser, him eylan dê xwi geyrenê, him zî hukmatî protesto kenê....

Ez vana ecêba may ma zî anasar yew çî bikê, sebeno?.. Mesela Taksîm di, Bakırköy (meydanê Azadiyan) di, Derbekir/ Amed (Berê koy) di...

Zazay!.. zazay!.. Şima koray?.. Şima Sekenê, Çikenê?.. Şima me ra vanêse?!..Key vengê şima nêvejiyeno?!... Herra mergi şima sero biya!... Sebiyo şima? Eke şima nêmerdiyse veng bidê!.. Veng!...

Luîs Puenzo:1946 di Buenos Aires ti marda xwi ra biyo. 19 serre di Kovran dê sinemayan di xebitiyayo. Tira pey kaş kerdoxey, viraştoxey, nuş toxey û pradûktorey kerda...

FÎLMÊ ÎEY BÎNÎ:
1973 Lucas de mıs Zapatos
1975 Las sorpreras

CEMAL PÎRANIJ

## AZADÎ

### Viyana



ABDURRAHMAN DURRE

Ev demeke xurt û dirêj e ku ji bo dameziran-dina parlementoya Kurdî li derî welat (li surgûnê) xebatên germ û çalakiyên hêja têne kirin. Me jî li gorî vê gotina pêşiyan "jî tunetiya mêran navê dîk datînin Ebdurehman) di nava Komîteya Amadeker de cih girtiye û em dixebitin.

Hefteyekê berê, em çûn Viyanayê, di vî bajarî de me çend civîn û konferansên baş çêkirin, bi şexsiyetên siyasî (rêzan) û zanyar re em axivîn. Tiştê ku pir bala min bi aliyê xwe ve kişand, ev bû ku Viyana, ji qirêjî û gemariya barbar û hovên Osmaniyan paqij maye, ku hê jî wê paqijaya xwe diparêze, wekî Romanya, Yugoslavya û derên din, bi wan gur û hovên Asyaya Navîn nelewitiye û perişan nebûye.

Zanyerekî Viyana yê, ji me re wiha got:

-Osmaniyên hov û barbar şêrperçeya (qanser) însaniyetê bûne, ketine ku derê qedandine û perîşan kirine. Ev çend qirn di ser re derbas bûne jî, hêj ew nexweşî û illet û mekrobên van neqediyane. Şer û ceng û tevlîheviya, Bosna Herseke, Kafkasiya,Qibris, Kurdistan Afganistan û derên din hê jî fesadî û tevdan û meqrobiya tirk û Osmaniyan e ku bûne bela serê cihanê û qansera însaniyetê.

Me jî bersiva wî wiha da:

-Gelê tirk hemû ne xerab in di wan de jî mirovên demokrat û qenc hene, lê ferman bi destên wan di dema osmaniyan de jî, niha jî, faşist û barbar in. Belê, wî zanyarê kal û şareza, serê xwe hejand û wiha got: "Çêjikên maran jî mar in. Gur zû bi zû kedî nabin."

Xwendevanên hêja, bi rastî ji bilî caş û faş û ker û xayînên kurdan, her kesî, faşistên tirkan û kemalistên bêdîn, qenc û baş fêm kirine û dizanin. Lê sed mixabin caşik, û xayîn hê jî li dû wan digerin, bi zirt û fort û vir û derew û qeleşî û durûtiyên wan dixapin. Xwedê hişekî bide wan. Emrê caşikan jî dirêj bike ku zû mezin bin û bibin kerên me, ne yên dijmin..

**"Viyana xweş mekan e, lê çi kim dernayê bîna min**
**Welatê min ku Kurdistan e, bê wî nayê jîna min.**

**Bi dinyayê hemû nadim, ji Kurdistanê yek warek**
**Ji her teqlîdî azad im ku ev fikr û yeqîna min**

**Kewê warê welat im ez li qada xurbetê dîl im**
**Ku bêsebr û tebat im ez, dina lim, tê qibîna min.**

# Kirmî biçûk î xak, bo kiwê deçî?

## Çîrok bo mindalan (soranî)

Hebû, nebû, baxêk î gewrey pir le gul û sewzewanî û dirext hebû. Le jêr xakî em baxe da kirmêkî biçûk dejiya, hemû rojê, ser le beyanî zû le xew radebû û serî biçûk î le xak dejend û karî ew şikirdinewey xakî baxeke bû. Rojêk le xew rabû û le ber xoyewe witî: "Ay ke min çi karêkî bêsûd dekem?! dirust kirdin î em hemû kun û çale lem baxe da çî sûdêkî heye?"

Diway ewe, maweyek biri kirdewe, diwatir biriyarî da ke dest lem karey helgrê û karêkî be sûd tir bigrête dest, bo em mebeste le jêr zewî derkewt û berew rûy ser zewî hat, tav zor nebû helhatibû, çawanî kirmî xak be bînînî tîrêjî tav duçarî azar bûn, gulî sûr taze pişkutibû, çaw be kirmî xak kewt û be sersurmanewe lêy pirsî: "Kirmî biçûk î xak, çî dekey lêre?!"

Ewîş serî bilind kird û witî: "Biriyar im dawe karêkî tir encam bidem, êdî namewê le jêr xak da bimênim, dil im naxwazê karî jêr xak bikem." Gulî sûr pelekanî xoy raweşan û witî: "Kirmî biçûkî xak, to baştirîn kar bo em baxe encam dedey, mero!" belam kirmî biçûk hîçî newit û le gulî sûr dûr kewtewe.

Tav le nawendî asman bû, kirmî biçûk, hem germay bû, hem nexoşîş bû, le nakaw çawa be pepuleyek kewt ke le ser gulî wenewşe helnîştibû, kirmî xak be xoy wit: "Xozî minîş demtiwanî bifirim!"

Pepule giwêy lê bû, witî: "To natwanî bifirî, le ber ewey balit niye!" Paş qise kirdinêkî zor, pepule kirmî xakî helgirt û le ser rûy gulî weneşe dayna. Cend rojêk derbaz bûn, gulî wenewşe û hemû pepulekan be kirmî xak rahatibûn, belam ew roj le diway roj, lawaz û lawaz tir debû, le ber eweş ke neydetiwanî bifirê, wekû dîl be ser gulî wenewşewe gîrî xwardibû.

Ser le beyaniyek, dilopêk şewnim kewte ser rûy gulî wenewş û çawî be kirmî xak kewt û be sersurmanewe lêy pirsî: "Kirmî biçûkî xak, çî dekey lêre?!" Kirmî xak zor dilxoş bû bewey ke carêkî dî nawî xoy bîst û witî: "Demwîst karêkî baş tir û be sûd tir bo bax encam bidem, welê..."

Şewnim witî: "Belam to natwanî hîç karêk lêre encam bidey, min çendîn car le asmanewe dême xawr û derjême naw cogele û rûbarekanewe û dubare be tîşkî tav debimewe be helim û deçimewe asman, her min dezanim to çi alîkariyekî mezin pêşkeş be dirextan dekey!"

Kirmî xak be sersurmanewe witî: "Cî core alîkariyek?! min hîç alîkarî ewan nakem." Şewnim witî: "To le jêr zewî da rêge û çal dirust dekey, bem karet alîkarî regî dirextan dekey bo ewey baş tir henase bikêşin."

Kirmî xak zor dilşad bû û destî kird be pêkenîn, germî tav be gulî wenewşe geyişt, şewnim witî: "Min her êsta debim be helim û deromewe bo asman, wa baş e toş bigerêytewe jêr xak."

Kirmî xak be xoşhaliyewe be rê kewt, her çonêk bû tiwanî le gulî weneşe bête xwar, royişt û royişt ta be gulî sûr geyişt, gulî sûrîş be bînînî kirmî xak ziyatir geşayewe, kirmî xak dîsanewe gerayewe jêr zewî û destî be karî xoy kirdewe.

**Wergêr le farisiyewe: Bekir Bahoz**

Hevalên
min ên biçûk.
Ez baş im,
hûn çawan in.
Ez bûme du salî
û hemû zarokên
dinyayê maçî dikim.

**ARJÎN**



# NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Ji Yugoslavyayê nameyek

Hevalên hêja... Berpirsiyarên rojnameya Welatê Me. Di pêş de silavên me yên germ ji we re û em ji dil û can karê we yê hêja, pîroz dikin.

Em niha li Yugoslavyayê li dorî 15 xwendekarên Kurdistanî ne. Em ji başûrê welat yê biçûk in, xwendina doktoriya mirovan dikin û em di sala dawî de ne, ango nêzîkî qedandinê me.

Berî niha bi sê salan, ango berî cenga Yugoslavyayê, pir xwendekarên kurd hebûn û pirî wan di nava refên Yekîtiya Xwendevanên Welatparêzên Kurdistanê (YXWK) ku di sala 1989'an de damezirîbû, karê welatparêziyê bi rê ve dibirin û pir çalakiyên hêja dihatin lidarxistin.

Lê mixabin şerê ku li Yugoslavyayê rû da û hilweşîna federasyon û komarên wan, zor tade li kar û çalakiyên xwendevanên kurd ji kir û em jî li gorî parçebûna wan ji hev belav bûn. Hin ji me li Komara Xirvatîstanê man, hin li Yugoslavyaya nû man û mixabin hin hevalên me heta roja îro li bajarê Saraybosnayê li Bosnayê man, di bin merc û hoyên şer yên nexweş de. Tenê em zanin ku ew sax in û kî li wir asê mane, nikarin bên der. Berî du salan rojnameya Welat ket destê me û me di cih de têkilî pê re danîn û pir kêfxweşiyeke mezin dida xwendekarên kurd û çend gotar li ser rewşa Yugoslavyayê, di Welat de hatin belavkirin.

Lê mixabin dû re ji ser me hat birîn û me nizanîbû sedem çi ye.

Berê mehekê li şûna wê Welatê Me, ket destê me û kêfxweşiya me mestir bû û hêzek xurtir da me, ji ber vê yekê em dixwazin alîkariyê li gorî derfetên xwe ji Welatê Me re bikin û em di têkilî û danûstandina de bin.

Di gel silavên germ û bi hêviya rojên azad.

**Merdo/Yugoslavya**

## Silavên bi dostî hevalino

Ev bû hefteyê dudiyan hûn anketekê çap dikin. Gelek spas, min anketa we tijî kir, lê hinek pirs hebûn ku bersiva wan incax ez di nameyê de karim bidim.

Em giş dizanin ku rojnameya Ö. Ülkeyê hate girtin. Rûpelên nûçeyan gerek e zêde bibin. Rojnameya Welatê Me van rojan di dilê me de cihekî girîng girtiye. Xwendevanên we roja yekşemê bêsebr diçin bayiyan. Ev 3 meh in rojname derketiye, polîtîkaya weşanê heta niha ji me re îmajekî bihêz nedaye.

Tu ihtiyaca me bi beşa falê tune ye.

Ji bo bersiva xaçepirsê xwendevan giş rojnameyê diçirînin.

Hûn jî dizanin li bajarê me, îmkanên me hindik in. Em li vir nikarin pirtûk û kovaran tim bixwînin. Hûn nasnameya weşanên nû didin. Lê ew weşan çawan dikevin destê me, gerek e hûn di vî hawî de alîkariyê bidin me.

Ez rind dizanim ev rojname, ya me ye, çi kêmasî û çewtî hebin, ew jî yên me ne.

Îro serê sibê ez çûm bayî, xortek rastî min hat, di dest de rojnameya Welatê Me hebû. Me silav da hev, min pirsî: " Tu vê rojnamê dixwînî?" Got: " Tev naxwînim, ji bo tîraja rojnameyê distînim."

Em bîstekê bi hevdû re peyivîn, ji bo tîrajê standina rojnamê îcab nake, gerek e bixwîne. Ji wî min soz stand ku here malê, dê, bav û birayên xwe kom bike û bixwîne. Min rewşa xwe mîsal da jê re.

Mirov carekî hîn bibe, naxwaze zimanekî din bixwîne, lewre li pêş mirov behreke mezin û fireh bilind dibe. Mirov xwe diavêje nava wê behra freh û kûr. Zimanê me, çanda me, dîroka me ewqas fireh û kûr e ku aliyek Kafkas e di nava berfê de ye, aliyekî Heran e şîn e, bihar e, aliyekî Mehabad e, Koççgirî ye, Hewlêr e. Di her cihekî de Qadî Mihemed, Seyid Rizo, Ehmedê Xanî, Kawayê Hemdem Mazlum Doğan û Egîd derketine, pêlên wê behrê gazî me dikin.

Em jî behrê dibînin, lê destê me nagihijê. Kî çax me ew rexne li xwe kirin, kêmasiyên xwe bi dirûstî derxist holê, incax wê çaxê emê hinek bi pêş ve hirin. Destê me incax wê çaxê wê dirêjî wê behrê bibe.

Hevalino ez vê carê netirsiyam û min hinekî dirêj kir. Gotin pir in. Lê ez pir dirêj nakim.

Bimînin di xweşiye de.

**Ronî Jir/ Ruha**

## Hin daxwazên min hene

Ji bo wî karê we yê birûmet ez gelek sipas dikim û we hemûyan hembêz dikim.

Xwestinên min:

1–em dixwazin rojnameya me mîna dibistanekê dersên zimên bide û em fêrî zimên bibin, kemasiyên xwe temam bikin.

2–Bi mirovên ku ji ber dewleta tirk koç kirine re roportajan bikin.

3–Bi ronakbîr, rewşenbîr, nivîskar, muzîkhezên kurd re tekiliyan deynin, nivîsên wan derxin.

4–Nûçeyan li ser saziyên kurd bidin.

5–Qelîteya kaxizê baş bikin.

6–Di rûpelekî de (yekemîn) wêneyekî baş bila tim hebe.

7–Heke kemasiyên we hene biniwîsînîn ku xwendevan ji we re bişînîn. Tiştên mîna makîne, teyp, pirtûk û hwd.

8–Ji dîrokê, ji dîroka dîn û li ser dîroka gelên din ên Kurdistanê wekî asurî, suryanî, ermenî û tekiliyên wan ên bi kurdan re bisekinin.

9–Îd û rojên kurdan, adetên kurdan û yê cîranên wan...

Bila rojnameya me feqîr xuya neke.

Bimînin di xweşiyê de.

**Rojhat Bozan/ Stockholm**



# JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

## Welatê Me û nûçe

Ji heftiya ku rojnameya Özgür Ülkeyê hate girtin bi vir ve, me pêwist dît ku cihê ji nûçeyan re vediqandî firehtir bikin, ji bo ku zêdetir nûçe (xeber) bigihîn we. Tevî vê yekê gelek xwendevanên me hê jî nûçeyên ku em didin, kafî nabînin. Berê me sê rûpel ji nûçeyan re vediqetandin, piştî girtina Özgür Ülkeyê me ew hejmar kir çar-pênc.

Ya rastî, em her hefte şanzdeh rûpelî ji nûçeyan re veqetînin jî, dîsa ne mumkûn e ku em biikaribin hemû nûçe û qewimînên girîng ên pêvajoya heftiyekê di rojnameyê de bi cih bikin. Ji ber vê yekê, gerek e xwendevanên me ji bîr nekin ku Welatê Me ji heftiyê carekê derdikeve û li derveyê îmkanên wê ye ku bi qasî rojnameyeke rojane nûçeyan biweşînin. Di pêvajoya heft rojan de, ji agahiyên ku em ji gelek deveran bi dest dixin, em tiştên li gorî xwe girîng dineqînin û diweşînin. Heta ji destê me tê em nûçeyên ku rasterast kurdan û yên bi awayekî, zehfê raya giştî ya dinyayê eleqedar dikin, dineqînin ji bo weşandinê. Bêguman heta ku rojnameyeke din a rojane ya pêşverû neyê weşandin, emê giraniya ku em didine nûçeyan bidomînin, lê li aliyê din em naxwazin mijar û warên din ên wêjeyî, çandî, hunerî û hwd jî zêde îhmal bikin. Esas hêviya me ew e ku demek ji ya din zûtir kurd li zimanê xwe xwedî derkevin, hejmara xwendevanan bigihe deh hezaran, hingê êdî mumkûn e ku rojnameyên kurdî rojane jî derkevin. Lê ev niha tenê hêvî û temeniyek e. Ji ber ku halîhazir hejmara kesên ku bi kurdî dixwînin têra weşaneke hefteyî jî nakin.

**ANKETA WELATÊ ME**

Heta niha li dora 200 anket ji aliyê xwendevanên me ve ji me re hatine şandin. Helbet ev hejmar li gorî hejmara xwendevanên me hindik e, ji ber ku hîn ne gihaye ji sedî dehan jî . Hêviya me ew bû ku hindiktirîn ji sedî dehê xwedevanên Welatê Me bersivê bidin pirsên me, ji bo ku encameke pir baş jê bête standin. Em di vê hejmarê de jî nikarin netîceya anketê biweşînin, ji ber ku hê jî her roj çend heb anketên din tên û yên ku ji Ewrûpayê şandine, zehfê wan hîn negihane destê me. Emê bi qasî çend rojên din jî li benda anketên di rê de ne, bisekinin. Li gorî texmîna me di hejmara 18'an de emê netîceye wan karibin bi dorfirehî pêşkêşî we bikin. Ez li ser navê hemû xebatkarên Welatê Me Cejna Remezanê ya hemû xwendevanên me yên misilman pîroz dikim. Bimînin di xweşî û aştiyê de.

# Berpirsiyariya nivîskaran û Yaşar Kemal

Dostoyevskî dibêje: "Her mirov ji herkesî, ji hemû tiştan berpirsiyar e." Rastiya vê peyvê her ku roj derbas dibe, hê xurttir dibe. Çiqas ku civaka neteweyî tevî civaka mirovahiyê bibe, her ku mirov di nava civaka mirovatiyê de nêzîkî hev bibin, em tev bi hev re hê bêhtir ji hev berpirsiyar dibin. Ew germenên (elman) ku li dijî rejima naziyan derneketin, me tev ew wekî hemparên (şirîkên) gunehên vê rejîmê dîtin. Çi li nava me, çi li welatekî din pêkutiyeke nîjadî (irqî), aborî, ekonomîk çêbibe û kesên ku vê neheqiyê nebînin tev berpirsiyar in. Di demeke ku di navbera neteweyan de çûn û hatin, xeberdan ewqas hêsan bûye, li devereke dinê ku neheqiyek pêk were em tev hemparên wê neheqiyê ne.

Dengbêjekî ku berpirsiyariya xwe bi dengbêjiya xwe bi cih neanîbe, em nikarin lê bikin şerm û em wî biçûk bibînin. Nezanbûna wî, bicihneanîna mesûliyeta xwe ya însanî, jê re şerm tê dîtin. Gava ku nivîskarekî li ser rewşa dinê tiştekî nebêje em karin jê re bibejin: "Çima tu behsa wan tiştan dikî, lê tu van tiştên din nayenî zimên? Madem ku tu dixwazî tiştinan biguherî, tu çima van tiştan diguherî, lê wan tiştên din tu naguherî? Tu çima dixwazî çapa pûlên posteyê bê guhertin, lê li welatekî ku dijminantiya cihûyan dibe, tu naxwazî ev dijminatî ji holê rabe?"

Divê her gav nivîskar karibe bersiva van pirsan bide: "Tiştên ku tu dixwazî biguherî çi ne? Çima ew, ne ev?"

Min ev nivîsar a jor ji pirtûka Jean Paul Sartre, a ku bi Tirkî bi navê "Denemeler" e û di nava weşanên Sayê de derketiye, hilda û wergerande ser zimanê kurmancî. Ji ber ku mînakeke pir girîng e li ser rewşa nivîskariyê.

Sartre, di şerê Cezeyîrê de li dijî Fransayê, di gel fransîbûna xwe li nik Cezayîrê cih girt. Sartre terefgir bû. Lê ne terefgirê neheqiyê bû. Ji ber van xusus iyetên xwe di vî şerî de destgiriya Fransa nakir, jixwe ev jî wezîfeya wî ya mirovatiyê bû. Tim û dayîm tiştên ku rast zanibûn dinivîsî û dianîn zimên, Ji ber van ramanên xwe jî, ne ji girtinê tirsiya, ne ji ber pekutiya dewletê ji vê yekê xwe da paş. Li welatê me yê ku ev 70 sal in di bin pekutiya KT'ê de ye û tim xwîn rijiye, kurdên ku dengên xwe derxistine yan serê xwe rakirine bi kuştinê, bi daliqandinê, bi satorkirinê, bi windakirin û îşkenceyê hatine cezakirin.

Der heqê vê pirsgirêkê de nivîskar, ronakbîr û rewşenbirên ku dengên xwe derdixin û vê zilmê bi lêv dikin jî, ji wan astengî û pekûtiyan para xwe distînin. Hê jî gelek nivîskar û rewşenbîr ji ber derbirîna (îfadekirina) ramanên xwe yên li ser pirsgirêkê di girtîgehan de ne, an jî li ber deriyê dadgehan in. Di nav van kesan de tirk jî hene. Le çi feyde ku pir kêm in. Çiqas ku hejmara wan hindik be jî fedekariya mamoste Beşîkçî, Haluk Gerger, Fikret Başkaya û hwd. wê her dem di bîra gelê me de be.

Yek ji van nivîskaran, yekî herî mezin jî wekî ku tê zanîn Yaşar Kemal e. Nivîskarê mezin, dewlet, dozger û dadgeh li xwe heyirandine. Ji ber ku ji aliyê dinê ve tê nasîn û li hundir jî alîkariyeke mezin pê re heye. Ku bi ya dilî wan bûna wê ew bi diranan bifetisandana.

Bedran Bênav

## FERHENGOK

**Bandor:** Hîkarî, tesîr
**Dengîn:** Navdar, binavûdeng
**Dezgeh:** Sazî
**Dezgîn:** Hefsar
**Dêmarî:** Jinbav, damarî
**Direwş:** Sencex
**Dûrik:** Kilam
**Gerdûn:** Kaînat
**Lêborîn:** Efûkirin
**Mindal:** Zarok
**Pejirandin:** Qebûlkirin
**Pêkanî:** Derfet, îmkan
**Radî:** Arizî, taybet
**Ragihandin:** Komînîkasyon (İletişim)
**Şano:** Tiyatro
**Şênî:** Ahalî
**Wêje:** Edebiyat
**Zagon:** Qanûn
**Ziya:** Marê mezin


## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me Divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 400.000 TL | ☐ 35 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 800.000 TL | ☐ 70 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.600.000 TL | ☐ 140 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ....................................
**NAVNÎŞAN** : ....................................
....................................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 2491344 – 245 29 91



**WELATÊ ME**

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)
**Metin AKSOY**

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**

Redaktor
**Sami TAN**

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
249 13 44 – 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye**– Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin**– Silêman Sido
49-30-69 00 26 95
**Bonn**– Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Hannover**– Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg**– A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen**– Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg**–
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
**Swed**– Amed Tigris
46-8-740 69 81
**Amsterdam**– Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Paris**– M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atina**– Sîrwan Reşîd
Bekir Bahoz
30-1-3634905


www.arsivakurd.org

Endama komeleya jinan (Courage) Xanim M. Jansen ji bo piştevaniya Leyla Zana bi me re peyivî:

# 'PIŞTGIRIYA ME JI DERYAYÊ DILOPEK E'



Leyla Zana di dema kongreya HEP'ê de tê dîtin

## Courage ango cesaret çi ye?

Courage yekîtiyeke jinan e. Ew di sala 1991'an de li Almanyayê hatiye damezirandin. Ji her neteweyî jinên xebatkar di nava vê rêxistinê de cih girtine. Endamên vê rêxistinê dixwazin ku jiyaneke bêkedxwarî û zordarî ava bikin, lewre ji bo mafên mirovan tê dikoşin. Ew li ser mijarên wekî mafên jinan, mafên xebata jinan û pêşeroja zarokan xebatên xwe didomînin.




Berga weşana Courage'ê

**Dema ku me bihîst çi ceza dane parlamenterên kurd, em şaş û metel man. Şekl û metodên mehkemekirinê, çaxa nasyonalsosyalîstên naziyan anî bîra me. Di wexta naziyan de jî li dijî sosyaldemokratan, li dijî rexnegirên rejîmê dawe hatibûn vekirin.**

'Hezar dost hindik in, dijminek pir e.' Îro li derveyî welêt dost û hevalên dilsoz û delal destê xwe dirêjî gelê kurd dikin. Gelek komele û rêxistinên biyan bi awayekî xurt alîkariya kurdan dikin. Li Almanyayê ji wan komelan yek jî Yekitiya Jinan (Courage) e. Wan berî mehkûmkirina parlamenterên kurd ji bo serbestiya Leyla Zana gelek hewl dan. Li ser kar û barê rizgarkirina parlamenterên kurd bi taybetî jî Leyla Zana, endama vê komeleyê Xanim M. Jansen wiha got:

– Me li seranserê Almanyayê lîsteyên îmzayan ji bo rizgazkirina parlamenteran kom kirin û me ew ji hikûmeta Bonn û Enqereyê re şandin. Li bajarê Solingenê di nava çarçiveya Cejnek bo Kurdan de raporek li ser daweya DEP'ê hate xwendin. Di 29'ê Kewçêrê (meha 10'an) de jî li Kölnê kongreyeke jinan hate lidarxistin. Li wir jî der heqê Leyla Zana, bi taybetî rewşa Kurdistanê de me agahî dan.

Rejîma tirk ji ber biryara xwe ya mehkûmkirina parlamenterên kurd li dinyayê keterewşeke xerab, ji aliyê raya giştî ya dinyayê ve hate protestokirin. Xanim Jansen li ser vê biryarê bîr û baweriyên komela xwe anîn zimên:

– Dema ku me bihîst çi ceza dane parlamenterên kurd, em şaş û metel man. Şekl û metodên mehkemekirinê, çaxa nasyonalsosyalîstên naziyan anî bîra me. Di wexta naziyan de jî li dijî sosyaldemokratan, li dijî rexnegirên rejîmê dawe hatibûn vekirin. Mirov kare bibêje, Tirkiyeyê jî bi vê bûyerê wekî wan kir. Em bi tundî wê rexne dikin.

Xanim Jansen der heqê çalakiyên nû yên ku ewê ji bo rizgarkirina parlamenterên bikin jî ev got:

– Kampanyaya îmzayan bi raya me ji deryayê dilopek bû. Niha tevgereke navneteweyî li ser piyan e. Em hemû ji bo rizgarkirina Leyla Zana û parlamenterên din dixebitin. Em dixwazin bi hêz û komên din re jî danûstanê bikin. Mînak bi dîtina min DEP partiyeke sosyaldemokrat bû, ji ber vê sedemê em dixwazin bi SPD (Partiya Sosyaldemokrat ya Almanyayê) û bi giştî jî, bi siyasetvanên li vir re peywendiyan deynin.

Xanim Jansen li ser şerê qirêjî yê li dijî gelê kurd jî disekine û ji hikûmeta tirk û alman van daxwazan dike:

–Em dixwazin ku şandin û firotina çek silehan ji bo Tirkiyeyê were sekinandin, peywendiyên di navbera hikûmetên Bonn û Enqereyê de werin birîn. Ji hikûmeta alman dixwazin ku heke parlamenterên kurd neyên berdan, ew hemû têkiliyên xwe yên bi Tirkiyeyê re bibire. Divê hikûmeta tirk jî parlamenterên kurd tavilê serbest berde û qirkirin û kuştina gelê kurd rawestîne, bihêle ku ew serxwe bijî.

SEYDO CAN/ ALMANYA

*elinewêrek*







www.arsivakurdi.org